

TARÎXÊ XONAMEKERDIŞÊ KIRDAN

Bîlal ZÎLAN

Grûba komelkî ya kurdan ke tarîx de bi nameyanê “Dimilî/Dunbulî” û “Ekrad-ı Zaza” (Kurdê Zazayî) behsê înan bîyo, ca ra ca xo bi nameyanê Kird, Kirmanc, Dimilî û Zaza, ziwanê xo zî bi nameyanê Kirdkî, Kirmancî, Dimilkî û Zazakî, mintiqaya xo zî bi nameyanê Kirmancîye û Kirdane name kerdo. Têkilîyêka nêzdîye mîyanê nê nameyanê cîya-cîyayan û tarîxê na grûba komelkî ya kurdan de esta. Na meqale de nameyê Kird û Kirmanc ke nameyê etnîkî yî û nameyê Dimilî û Zaza ke nameyê komelkî yî, hetê kokê xo yê tarîxî ra do bêrê analîzkerdiş.

1. DESTPÊK

Kurdî sey miletêk cîya-cîya grûbanê komelkîyan ra yenî meydan û bi lehçeyanê cîya-cîyayan qisey kenî. Grûbê komelkî yê kurdan zî xo bi nameyanê cîya-cîyayan name kenî yan zî teber ra cîya-cîya name benî. Kurdê ke nê seranê peyînan hîna zaf bi nameyê “zaza” yenî şinasnayîş, ca bi ca xo ra “kird”, “kirmanc”, “dimilî” û “zaza” vanî. Herçiqas nê nameyan ra ewro çekuya “zaza” bineyna meşhur bîya zî, nê heme nameyî prosesê tarîxî de ameyî gurênayîş û ewro zî vajîyenî.

Faktorê xonamekerdişî prosesê tarîxî ra girêdaye yî. Şarî ge-ge bi nameyê etnîkî, bi nameyê komelkî, bi nameyê eşîrkî û bi sewbîna tewir cîya-cîya xo name kerdo. Bi rastî nê tewir namekerdişê cîya-cîyayî hem kurdanê bînan mîyan de, hem zî mîyanê sewbîna miletan de estî. Mesela eslê xo de *Soran* Kurdîstanê Başûrî de nameyê mintiqayêk o, la nika bîyo nameyê grûbêka kurdan û sey *sorankî* bîyo nameyê lehçeya înan û ê ke na lehçe qisey kenî teşmîlê hemîne bîyo. La ê xo sey *kurd* yan *kirmanç* name kenî. Reyna almanî her çiqas semedê xo *deutsch* vajî zî teber ra semedê înan hîna zaf *alman* yan zî *german* vajîyeno.

Nê teblîxî de nameyê “kird” û “kirmanc” ke nameyê etnîkî yî û nameyê “dimilî” û “zaza” ke nameyê komelkî yî, hetê kokê xo yê tarîxî ra do bêrê analîzkerdiş. Sewbîna tewir namekerdişî zî estî ke yan sey “şarê ma” namekerdişê etnîkî û komelkî ra teber nameyê tebîî yî, yan zî sey “ginî, çarek, lol” tena teber ra û mintiqayêka tenge de vajîyenî yan zî sey “kirdas” û “kur” hetê kurdan ra semedê kurdanê bînan vajîyenî, ma bi kilmekî ca da înan zî.¹

¹ Ma na meqale de tewr zaf xebata M. Malmîsanijî ra îstifade kerd. Reyna, xebata ma de Roşan Lezgîn, Wisif Zozanî û Newzat Anukî hetkarîya ma kerd. Ma hemîne rê sipas kenî.

2. XONAMEKERDIŞÊ KIRDAN

2.1. Kird

Kurdê zazayî ke vakurê Dîyarbekirî, Çewlîg û Xarpêt ra cayê ke sînorê nê her di bajarên ra nîzdî yî de ciwîyenî, zafane xo sey “kird” name kenî. Kirdê ke nê cayan de ronîşenî, ziwane xo ra “kirdkî” yan zî “kirdî”vanî, mintiqaya xo zî sey “Kirdane” name kenî. Cîrananê xo kurmancan ra “kurmanc” yan zî “kirdasî” vanî. Ziwane kurmancan ra zî “kurmancî” yan zî “kirdasî” vanî.

Herçi qas çekuya “kird” manaya kurdê ke bi lehçeya zazakî qisey kenî de bêro şuxulnayîş zî, ge-ge bi hawayêko umumî manaya “kurd” de zî yena şuxulnayîş.² Xora çekuyê “kird” û “kurd” eynî kok ra yenî. Ma na xebata xo de telafuzo bîn, yanî çekuya “kird”î analîz kenî.

2.1.1. Derheqê Kokê Çekuya “Kird”î de

Cografyaya kurdan demeyêko derg binê hukmê Hurrî (ÎV.2300 – ÎV.1000) û Mîtannîyan (ÎV.1500 – ÎV.1300) de bî. Binê îdareyê nê dewletan de zaf sîte-dewletî zî ronîyaybî.³ Mintiqaya kurdan de nameyê zaf cayan nê wextan ra mendî û hetanî ewro xo pawîfî. Badê ke Mîtanî hetê Asurîyan ra rijîyayî gelek dewletê qijkekî vejîyayî meydan. Mesela, nê dewletê Mitanîyan ra Nîrbû (1280-650), ewro vakurê Hênîyî de mintiqaya Nêribey de bi nameyê hewt dewan⁴ û Kîrxû/Korxû zî bi nameyê dewa Licê Korxa resayî hetanî wextê ma.⁵ Nameyê ronayoxê dewleta Mitanîyan qral *Kîrta* yo; bi texmînî Îsayî ra ver (ÎV) serra 1500 de dewleta Mitanîyan ronaya û qralo yewin bîyo.⁶ Ma naye vajîme ke şarê dewleta Mîtanî hetê etnîkî ra Aryan bi, ziwane înan zî Hînd-Ewropî bi, hetta ziwane Hurrîyan û ziwane Hîndî ra Sanskritî mîyan de gelek çekuyê muş-terekî tespît bîy. Coka, pêmanayîşê nameyê *Kîrta* û *Kird* no het ra manîdar o. Ziwane sanskritî de “**कीर्ता**” (klrti) yeno manaya “nam, namdar”.⁷

ÎV (Îsayî ra ver) 1400 ra mende yew tabletê Akkadîyan de beyntarê Mezo-

² “Bongilan de hema-hema her kes zaza-kurd o. Ê manaya kurdkî de ziwane xo ra vanî kirdkî ke teber ra nê ziwani ra zazakî yan dimilî vajîyeno” Mehmed S. Kaya, *The Zaza Kurds of Turkey: A Middle Eastern Minority in a Globalised Society*, Tauris Academic Studies, London 2011, r. 4 û destpêkê tercumeyê kitabî ra (No tercume hema nêweşanîyayo.)

³ Mehrdad R. Izady, *Kürtler Bir El kitabı*, Doz Yayınları, İstanbul 2004, r. 71-76

⁴ Nameyê dewanê Nêribê nê yî: Nêribê Axan (Kuyular), Nêribê Cimsaqî (Eşkin), Nêribê Çulagan (Abacılar), Nêribê Topalan (Topçular), Nêribê Şeynan/Nêribê Wisifan (Çukur), Nêribê Elîyan (Atıcı), Nêribê Melîkan (Bozok)

⁵ Halis Ataksoy, *Diyarbakır Tarihinde Komuk Eli*, Hazırlayan: Yılmaz Ataksor, Çeltüt Matbaacılık, İstanbul 1988, r. 27 üdc.

⁶ Wikipedia, Mitannî, <http://en.wikipedia.org/wiki/Mitanni> (resayîş: 03.04.2012)

⁷ Sanskrit Dictionary, <http://spokensanskrit.de/>

potamyaya corêne û behrê Wanî de bi nameyê *Qurtîe* yan zî *Kurtîe* yew dewleta koyî ra behs beno ke no ca hetê Kassîfîyan ra fetih bîyo. ÎV destpêkê se-serra 6. ra mende yewna tabletê Babilîyan de zî behsê mintiqaya *Kardaka* beno. Bi îhtîmalêko pîl nê nameyî seke çimeyanê Yunan û Romayijan de vî-yareno sey *Corduene*, *Gorduene*, *Gordylene*, *Korduene* bedelîyayî. Goreyê M. Izadyî nê nameyî dima vurîyayî û bîyî qebîleya *Girdî* ya kurdan.⁸ Seke cor de zî behs bi, kirdî cografyaya xo sey *Kirdane* (Kirdone) name kenî. No name û namekerdişê mintiqaya *Korduene* zaf pê ra nêzdî yî. Çekuya “gird” zî kirdkî de yena manaya “xişn, pîl”. Alimê tarîxê kurdan Cemal Reşîd Ehmed zî *Kordone* sey “welatê kurdan” mana keno.⁹

Tarîxnasî wexto ke kokê tarîxî yê kurdan analîz kenî, çekuyanê “kardu/karduxî”, “kurtie/qurtie”, “cyrtii” ser o vîndenî.¹⁰ Semedo ke cografyaya kurdan û cografyaya ke nê şarî tede ciwîyayî eynî ya û hetê etîmîlojî ra zî çekuya “kurd/kird” û nê çekuyê ke ma hûmaritî pêmanenî, zafê tarîxnasan bala xo daya nê nameyan ser. Tarîxnaso romayij Strabo (ÎV 64–ÎP 24) wexto ke cografyaya Medya dano şinasnayîş, bi nameyê “Κύρτιοι” (wendîşê ci: Kîrtî) yew şarê koçerî ra behs keno.¹¹ Goreyê nê malumatan “kîrtî” o çax dormaleyê koyanê Zagrosî de ciwîyayênî. Kurdolog Viladimir Minorsky wexto ke tarîxê kurdan ra behs keno, bale anceno *Cyrtii* ser. Goreyo ke Minorsky neql keno, tarîxnaso yunanij Polybe (ÎV 208–ÎV 126) û tarîxnaso romayij Livy (ÎV 59–ÎP 17) zî behsê *Cyrtii*, *Cirtei/Cirti* kerdo.¹² Goreyê nê malumatan, ÎV 220-171 de tayê şerî ke mîyanê Roma, Seleucid û Bergama de ameyî meydan, *kîrtan* ra zî tayênan nê herban de sey lejyoneran ca girewto. Nê çekuyî heme sey “kîrtî” waniyenî û zafhumarê çekuya “kîrtî” yî. Seke aseno nê çekuyî hetê etîmîlojîkî ra çekuya “kird” û zafhûmarê ci “kirdî” manenî.¹³

Nuştoxê ke etîmîlojîya çekuya “kurd”î ser o vîndenê, bale ancenî çekuya

⁸ Mehrdad R. Izady, *Kürtler Bir El kitabı*, Doz Yayınları, İstanbul 2004, r. 75

⁹ Cemal Reşîd Ahmed, *Ataların Karşılaşması / Derbend ve Şervan Ülkesinde Kürtler ve Alanlar*, Erebkî ra tercume: Sıraç Direk, Avesta Yayınları, İstanbul 1998, r. 172

¹⁰ V. Minorsky, “Kurds, Kurdistan”, *The Encyclopedia of Islam - V*, Brill, Netherlands 1986, r. 447-449

¹¹ Strabo, *Geography*, XI, r. 13, 3 û XV, r. 3, 1

- *The Geography of Strabo V*, Tadayox: Horace Leonard Jones, William Heinemann 1961, r. 304-305

- *The Geography of Strabo VII*, Tadayox: Horace Leonard Jones, William Heinemann 1930, r. 157-158

¹² V. Minorsky, “Kurds, Kurdistan”, *The Encyclopedia of Islam* ra neql: Th. Bois, D. N. Mac Kenzie, V. Minorsky, *Kürtler ve Kürdistan*, Doz, İstanbul 2004, r. 45

¹³ Malmîsanij, *Kird, Kırmanc, Dımılı veya Zaza Kürtleri*, Deng Yayınları, İstanbul 1996, r. 4

“gord”î ser ke fariskîya verêne de yena manaya “qehreman”î.¹⁴ Yusûf Zîyaeddîn Paşa zî ferhengê xo de (1894) di manayanê çekuya “kurd”î qeyd keno: “1. Nameyê kurdan, 2. Egîd, cesûr, wayîrê xîretî”.¹⁵ Seke yeno zanayîş, çekuya “gird” kirdkî de zî manaya “xişn, pîl” de şuxulnîyena û çekuya “kird” manena. Labelê gereka ma nê çimeyanê arkaîkan bes nêvînî, bi ihtîyat biewnî û cigê-rayîşê xo bineyna bizêdnî.

2.1.2. Çimeyanê Nuşteki û Fekkîyan de “Kird”

Nameyê “kird” tarîxê nêzdî yê kirdan de tewr verî kitabê Peter Lerchî de vîyareno. Ziwanas Peter Lerch 1856 de sey yew wazîfedarê Akademîya Zanîstî yê Qralîyetê Rûsya, kurdê ke şerê Qirimî de mîyanê artêşa Osmanîyan de sey esîr kewtî destê artêşa Rûsya û Roslow de yew kampe de mendî, înan mîyan de gêrayo û fekê înan ra tayê metnê kirdkî û kirdaskî arê dayî.¹⁶ Dima nê metnî verî bi rûskî, dima zî bi almankî çap bîyî. Binê metnanê kurdî de manaya înan a almankî zî dîyaya. No kitab hetê tarîxê nuşteki yê kirdan ra zî zaf muhîm o. Çimkî kirdkî, reya verêne nê kitabî de ca girewta. Kitabê P. Lerchî de metnêk de qewxeyê Nêrib û Hêni ra behs beno. Weyra de axayê Nêribî Xelef Axa, merdimanê xo anceno pêser û eskeranê xo teşwîqê şerî keno. Qiseykerdişê Xelef Axayî wina vîyareno: “.... Xelef Axa va ke eskerî xo ra: ‘Bewnî axalêr! Ma şonî qewxe, metersî, eskerê Daqma Begî zav û, hema pêrû Tirk î, nêşênî ma de qewxe bikî, ma pêrû canmirdê **Kirdan** î, mêrdeî eşîran î, metersî, ma ha şonî.....’ ”¹⁷

Seke aseno ewta de Xelef Axa, xo û şarê xo heme sey “kird” name keno. Arêdayoxê nê metnî ziwanzan P. Lerch, hem binê metnê orjînalî de wexto ke manaya almankî dano hem zî cildê diyin de qismê “ferhengekê zazakî” de çekuya “kird” sey “Kurde” (kurd) tercume kerdo.¹⁸

Ehmedê Xasî peynîya kitabê xo *Mewlidê Kirdî* de çekuya “kird” şuxulneno. Kitab 1899 de Dîyarbekir de çap bîyo. No kitabo tewr verên o ke hetê yew kirdî ra safî bi kirdkî weşanîyayo. Coka destpêkê edebîyatê kirdkî yê nuşteki hesebîyeno.¹⁹ Ehmedê Xasî temambîyayîşê mewlidî ra wina behs keno: “Temam bi

¹⁴ V. Minorsky, “Kurds, Kurdistan”, The Encyclopedia of Islam ra neql Th. Bois, D. N. Mac Kenzie, V. Minorsky, Kürtler ve Kürdistan, Doz, İstanbul 2004, r. 48

¹⁵ Yusuf Ziyaeddin Paşa, Kürtçe-Türkçe Sözlük (El-Hediyye El-Hamidiyye fi'l-Lûgat El-Kurdiyye), Tadayox: M. Emin Bozarslan, Çıra Yayınları, İstanbul, 1978, r. 218

¹⁶ Seyîdxan Kurij, Zazalar ve Zazaca Yazını, http://www.zazaki.net/file/zazalar_v...pdf

¹⁷ Peter J. A. Lerch, Qewxê Nêrib û Hêni, Forschungen über die Kurden und die Iranischen Nordchaldaer - Band I, St. Petersburg 1857, r. 78

¹⁸ Peter J. A. Lerch, Qewxê Nêrib û Hêni, Forschungen über die Kurden und die Iranischen Nordchaldaer - Band II, St. Petersburg 1858, r. 197

¹⁹ Roşan Lezgîn, “Mewlidê Kirdî”, <http://www.zazaki.net/haber/mewlid-kird-57.htm>

viraştişê Mewlidê **Kirdî** bi yardimê Xaliqî û feyz û bereketê peyxemberê ma, sellelahu eleyhî we ela alîhî we sellem, bi destê Ehmedê Xasî Hezanicî di henzar û hîrê sey û şîyyes serrî de bi tarîxê erebî.”²⁰ Seke aseno nuşttoxê kirdan yo yewin Ehmedê Xasî, ziwane xo ra “kirdî” vano.

Derheqê xonamekerdişê kurdan de sosyolog Zîya Gokalp wina vano: “Mi wextêk kurdî bi tetkîkê eseranê înan yê edebî panc grûban de tesnîf kerdîbî. Nê panc grûbî nê yî: Kurmanc, Zaza, Soran, Gûran (Goran), Lur.”²¹

“Nê qewmê kurdî hem xo hem zî yewbînan cîya-cîya name kenî. Mesela, kurmancî xo sey ‘kurd’ name nêkenî, vanî ma ‘kurmancî’ î. Nê zazayan ra ‘dunbulî’ vanî. Kurdê Başûrî ke hetê tirkan ra sey ‘kurdê Babanî’ name benî, [kurmancî] înan ra ‘soran’ vanî. Ziwanê ke pê qîsey kenî, ci ra ‘kurmancî’ vanî.

Eke ma bêrî zazayan ser: Nê bi kesreyê kafê Erebi xo ra **kird** vanî, kurmancan ra zî *kirdas* vanî. Labelê tirkan nameyê *kurdî* teksîsê kurmancan kerdo. Wexto ke ‘felan merdim kurd o, yan zî zaza yo’ vajîyo, *kurd* ra meqsed *kurmanc* o. Reyna nînan ke nameyê *zazayî* dayo *dunbulîyan* tirkî bi xo yî. Ne zazayî ne zî kurmancî nameyê *zazayî* nêşuxulnenî.”²²

Goreyê Kemal Badilî, kirdî seba ke xo kurdê esil vînenî coka xo sey *kird*, kurmancan zî sey *kirdasî* name kenî: “Tirkîya de zazayî xo sey kurdê esilî he-sebnenî û xo ra **kird**, xo ra teber kurdanê bînan ra, bi îfadeyêko hîna rast kurmancan ra zî *kirdasî* (Kürdümsü, Kürtçük) vanî. Kurmancî, zazayan ra nadîren *zaza*, la hîna zaf *dimil* (Dimilî: Dımılı/Dımılce) vanî.”²³

Qaso ke Malmîsanij neql keno, Gwevdereyic, yew meqaleya xo de wexto ke derheqê Çewlîgî (Çolig) de malumat dano, uca de behsê çekuya “Kird”î zî keno: “Zony Çolig **Kird** û. Tikye merdimy **Kird**, [zonî] ma rî vony Zazakî, tikye vony Dimilî. Lakîn ma vony **Kird**.”²⁴

Yew beyta ke hetê murîdanê Şêx Selahedîn Efendî ra vajîyena, uca de zî çekuya “kird” vîyarena. Na beyte sey “Gelê **Kirdo**, rind bizonî” dest pêkena.²⁵

Yew şîra Şêx Mehdî de zî çend cayan de çekuya “kird” vîyarena:

“(…) Ey şêxê mino rilişte / Ti ma r’ kenî qûm û nuşte / Tue **kird** xwi r’ key yew helquşte / Ti şew û ruc he y ser ruenişte. | Ey şêxê min feksuelaqi / Çi ben însû pey exlaqi / **Kirdî** r’ nîheyon nûn tueraqi / Ti wen leşê bueraqi. | Benû umnû

²⁰ Ehmedê Xasî, Mewlidê Nebî, Litoğrafya Matbaası, Dîyarbekir Vilayeti, 1899, r. 28

²¹ Ziya Gokalp, Kürt Aşiretleri Üzerine Sosyolojik Tetkikler, Sosyal Yayınlar, İstanbul 1992, r. 24

²² Ziya Gokalp, Kürt Aşiretleri Üzerine Sosyolojik Tetkikler, Sosyal Yayınlar, İstanbul 1992, r. 27

²³ Kemal Badıllı, Türkçe İzahlı Kürtçe Grameri (Kürmançça Lehçesi), 1965, Ankara, s. 6

²⁴ Gwevdereyic, “Çolig”, Demokrat (kovara sıyasi û çandî), no: 7 (Adar 1990), r. 20 ra neql: Malmîsanij, Kird, Kırmanc, Dımilî veya Zaza Kürtleri, Deng Yayınları, İstanbul 1996, r. 2

²⁵ Harûn, “Yew Beyta Mîridanê Şêx Selaheddinê Şêx Se’idî”, Armanc, Stockholm, no: 128, r. 10 ra neql: Malmîsanij, ecv. r. 2

qîjen mele / **Kird** şîn bajar ben 'emele / Dewûn d' xelû, cewû kenû cele / Şêx, melay ma ben qimil, mele. (...) Ti ser a şîn? Ti ser a şîn? / Ti cezme kuwên, hewa ra şîn / Ti sey fuzû, teyara şîn / Tue **kird** kew pird, ti ser ra şîn"²⁶

Deyîra "Şarik û Şîvon" ke mîyanê kirdan de vajîyena, tede çekuya "kird" vîyarena: "Koyê Sipî berz' koyon o / Ser' yê zî Şarik Şivon o / Şo ser bown' welat' **kirdûno** / Ez tîya ra şîya wo"²⁷

Yewna deyîra meşhure ya kirdan, "Deyîra Ehmedê Musayê Axon" de bi telafuzo umûmî çekuya "kurd" vîyarena: "Gidî leyro, mi va Delî Fikrî ne dîn o ne îmon o, leyro leyro / We bîyo qesabê ma **kurdon** o, **Kurdîston** o, leyro leyro, leyro Ehmedê mi leyro"²⁸ Na deyîra anonîme de, badê herbê Şêx Seîdî zulmê qumandanê tirkan Elî Heyder û Delî Fikrî ra behs beno. Seke aseno şarî, xo sey "kurd", welatê xo zî sey *Kurdîstan* name kerdo.²⁹

Kirdî mintiqaya xo ra *Kirdane* vanî. Kirdane, manaya xo ya ferhengî de yeno manaya "Kirdey, çîyo ke bi terzê kirdan o, kirdkî yo". Labelê Kirdane mîyanê şarî de yeno manaya "cayo ke kirdî tede ciwîyeni". Kurdanê bînan de zî çekuya *Kurdane* esta. Mesela nameyê albumê Sedîq Terîfî *Kurdane* (منادرك) yo.³⁰ Reyna, nameyê yew radyoya kurdan ke hîna zaf bi lehçeya lekî weşane kena zî *Kurdane* yo.³¹

Kurdanê bînan de çekuya *Kurdewarî* esta ke a zî manaya *kurdane/kirdane* dana. Kurdanê Başûr û Rohhelatî mîyan de çekuya "kurdewarî" ca bi ca manaya Kurdîstanî zî dana. Goreyo ke Malmîsnaj neql keno, şair Hêmin wexto ke "Kurdewarî, ey wulatî cwanekem" (Kurdewarî, ey welatê min o rindek) vano, na mana qest keno. Reyna ferhengê şair Hejar û ferhengî Mehabadî de zî "kurdewarî" manaya welatî de nusîyaya.³² Ferhengê Îzolî de na çekuye sey "munasibê urfê kurdan" îzeh bîya.³³

Manaya xo ya eslî ra vêşêr tayê cayanê Kirdaneyî de çekuya "kird" wayîrê

²⁶ Mehdî Özsoy, "Şêx û Mela", Çira, kovara kulturî, Hejmar 3, îlon 1995, Stockholm, r. 81-82
- cezme: cezbe, cûyî: cuwen, feksuelaqi: fekgilêjgin, helquşte: Tirkî de "tahtarevalli", rilişte: keso ke riyê yê amewo liştîş

²⁷ Na deyîre nê qesetî ra gêriyaya: Sait Kılıç, "Şarik Şivon", Album: Ez Mireno, 2007

²⁸ Deyîra Ehmedê Musayê Axon, Dengbêj: Hin Gewêlij, Newepel: Rojnameyo kulturî, Hûmare: 14, 01-15 oktobre 2011, r. 8

²⁹ Ozano Çewlîgij Rençber Ezîz zî çekuya "kird" ra heme kurdan qest keno: "Ma firset zaf da tirkûno / Tirkûn guret cey kirdûno" (Çira) Doğan Karasu, Dinya d' Yo Darê Ma Rençber Ezîz, Vate Yay., İstanbul 2012, r. 119

³⁰ Sedigh Tarîf & Kamkar Ensemble – Kordaneh, <http://delzendeha.blogfa.com/post-260.aspx>

³¹ Radyo Kurdane, <http://kurdane.com/>

³² Malmîsanij, Kird, Kırmanc, Dımili veya Zaza Kürtleri, Deng Yayınları, İstanbul 1996, r. 4

³³ D. İzolî, Ferheng: Kurdi-Tirkî, Türkçe-Kürtçe, Deng Yayınları, İstanbul, 1992, r. 246

manayêka sosyolojîk a zî. Yanî nê cayan de “kird” teberê keyê şêxan, axayan û mîreyan de yena şuxulnayîş. Mesela Pîran de bêxeyca Key Axan û Key Şêxan, reyna Gêl de zî bêxeyca Key Mîran semedê şarî “kird” vajîyeno.³⁴ Eynî manaya sosyolojîke seba çekuya “kirmanc/kurmanc” zî esta. Hetta dewrê Osmanîyan de çekuya “tirk” zî bêqîymet bî û yew cîyabîyayîşê komelkî nawitêne. Bi rastî her dewr de merdimê ke wayîrê sitatuya îdarî bî, waştö ke şarê bêsitatu ra xo cîya bikî. Ferhengê Fariskî de, manaya xo ya eslî het de “kurd” yeno manaya “şiwane (şane)” û “koçer” zî.³⁵

2.2. Kirmanc

Kirdê ke mintiqaya Dêrsim û Erzinganî de ciwîyenî zafane xo ra “kirmanc”, zıwanê xo ra zî “kirmanckî” vanî. Welatê xo zî sey *Kirmancîye* name kenî. Nê, cîrananê xo kurmancan ra “kirdas/kirdaş”, zıwanê înan ra zî “kirdaskî/kirdaşkî” vanî. Çîyo balkêş kirdê ke hetê Motkî/Modanî de ciwîyenî xo ra “kurmanc”, zıwanê xo ra zî “dimilî” vanî.³⁶

Çekuyê “kirmanc” û “kurmanc” eynî kok ra yenî, kurdanê bînan de zî ca bi ca “kirmanc” vajîyeno. *Kirmanc*, Dêrsim de herçiqaş manaya kurdê ke bi lehçeya zazakî qisey kenî de bêro şuxulnayîş zî, ge-ge bi hawayêko umumî manaya “kurd” de zî yena şuxulnayîş.

2.2.1. Derheqê Kokê Çekuya “Kirmanc”î de

Derheqê kokê çekuya *kurmanc/kirmanc* de çend fikrê cîyayî estî. Goreyê V. Minorsky, çekuya *kurmanc*, *kurd* û *mand* ra ameya pê û yena manaya “kurdê Medî”. M. Izady vano beno ke na çekuye *kurd* û *Manna* ra ameya pê û yena manaya “kurdê Mannayî”.³⁷ Celadet Bedirxan bi xo tayê nuştayanê xo de sey “kurdmanc/kurdmancî” şuxulnaya.³⁸ E. B. Soane neql keno ke Kurdistan de telafuzê çekuya *kurmancî*, sey *kurmanjî*, *kurdmanjî*, *kurmancî* telafuz bena û eslê çekuya *kurdmahî* ya. Reyna Soane neql keno ke goreyê tayê nuştöxan *mah* manaya “Med”î de ya.³⁹ D. N. MacKenzie zî îhtîmalê *kurd* û *Mada* (Median) ra behs keno.⁴⁰ Seke yeno zanayene kokê kurdan hetanî Medan (Îv serrera 7.) reseno.

³⁴ Malmîsanij, Kird, Kirmanc, Dımılı veya Zaza Kürtleri, Deng Yayınları, İstanbul 1996, r. 3

³⁵ Cemşîd Salehpûr, Farsça-Türkçe Genel Sözlüğü, Jangal Yayınevi, 1964 (?), r. 964

³⁶ Malmîsanij, “Derheqê Kirmancanê Modanî (Motkanî) de”, Vate: Kovara Kulturî, Numre 32, r. 74

³⁷ Mehrdad R. Izady, Kürtler Bir El kitabı, Doz Yayınları, İstanbul 2004, r. 299

³⁸ Celadet Bedirxan & Roger Lescot, Grammaire Kurde (Dialecte Kurmandji), Librairie d'Amérique Et d'Orient, Paris, 1970

³⁹ E. B. Soane, Grammar of the Kurmanjî or Kurdish Language, London 1913, r. 11

⁴⁰ D. N. MacKenzie, “Kurds, Kurdistan”, The Encyclopedia of Islam - V, Brill, Netherlands 1986, r. 479-480

Goreyê yewna teorî, *kirmanc* şaristanê kurdan Kirmanşan ra eleqedar o. Goreyê tayênan zî şaristanê *Kirmanî* ra eleqedar o. Goreyê nînan na çekuye yena manaya “kirmanij”, yanî keso ke şaristanê Kirmanî ra yan zî bajarê Kirmanşanî ra yo. Seke yeno zanayîş kirdkî de suffiksê “-ij” aîdîyetê cayî mojneno, sey “çewlîgij, pîranij, dewij”.

Goreyê tayê çimeyanê armenîyan “*Kirmançî* zıwanê armenkî de yena manaya ‘lajê kurdî’ yanî ‘kurdîzade’. Demê verî de wexto ke armenî yewbînan ra bicigrîyayênî vatêne ke ‘kurd mancî’ (lajê kurdî). Dima no telafuz bedelîyayo bîyo *kirmançî*.”⁴¹ M. Tayfun zî nê îhtîmalî ra behs keno ke “çekuya *kurmanç* çekuyêka pêrabeste ya û çekuyanê *kurd* û *manc* ra ameya pê. ‘Manç’ zî armenkî de yeno manaya ‘lajî’.”⁴²

2.2.2. Çimeyanê Nuşteki û Fekkîyan de “Kirmanc”

Kilaman û deyîranê Dêrsimî de çekuyê *kirmanc* û *kirmançîye* zaf vîyarenê. Ma nînan ra tayê nimûneyan bidî:

“De bîye bîye, wela begê mi bîye / Hêfê mi yêno be Sey Uşênî / Haq zaneno reyisê **Kirmançîye** / Ewro axlerê Dersimî dê arê / Berdê verê daraxaçîye...”⁴³ (Sey Uşen û Sey Riza)

“Derê Laçî bivêso / Yivisê mi gavan o / Bira pêro dê, na qewxa aşîre nîya / Merevê **kirmancî** û zalimanê tirkan o / Destê xo ra xo mecêrê / Sar ma rê qolaye vano / Pepug bêro binîso / Cêncûnê ma rê biwano...”⁴⁴ (Derê Laçî)

Na kilama cêrêne lajê Seyîd Rizayî Bava Îbrahîmî ser o bi fekê Seyîd Rizayî vajîyaya:

“Vacî vacî Bavayê ho ser o vacî / Bavayê mi şîyo Xozat / Cêno padîşayena **Kirmancî** / Dêrdê aşîronê Kowê Dersimî lacê mi bî / Ewro Şîna vesayîye de pêro ho ra kerdê rajî / Cinaza lazê mi wedarê / Ez o ser o komet û turbûn vi-rajî...”⁴⁵ (Bava)

Varyanto bîn wina yo: “Pîr Bavayê mi / Tekito şîyo Xozato vêsaye / Cêno Begligêna **Kirmancî**”⁴⁶

Bava, wexto ke 1933 de hetê tayê merdîmanê eşîra Qîrxanî ra kişîya; ey

⁴¹ V. Bardizaksi, B. Natanyan, K. Srvantsyants, Dersim Gizemi, Palu-Harput 1878, 2.Cilt, Derlem Yay., İstanbul 2010, r.144

⁴² İhsan Nurî, Kürtlerin Kökeni, Tercume: M. Tayfun, Doz Yay. İkinci Baskı, İstanbul, 1991, r. 111 (cênot)

⁴³ Zîfî, “Folklorê Kurdi ebe Zarava Dımilki”, Hêvî, Hejmar 1, Paris, Îlon 1983, r. 93

⁴⁴ Zîfî, “Folklorê Kurdi ebe Zarava Dımilki-II”, Hêvî, Hejmar 2, Paris, Gulan 1984, r. 114-115

⁴⁵ Fîrat, “Folklorê Dersimî ra-II”, Hêvî, Hejmar 5, Paris, Gulan 1986, r. 106

⁴⁶ Munzur Çem, Dersim Merkezli Kürt Aleviliği, Vate Yayınları, İstanbul 2009, r. 628

dima, mîyanê dêrsimijan de şer virazîyabi û tayê dewî tal bîbî. Na rewşe kila-
man de wina vajîyaya:

“Heqo ti carû naye qebug mekerê, / **Kirmanc** çitur **kirmancî** ver dewû tal
kero”.⁴⁷

Na kilame reîsê eşîra Balîyan ra Munzur Axayê Qeremanî ser o vajîyaya ke
hetê Dîyab Axayî ra 1930 de dîyayo kiştiş: “Mircanî ser o tef û duman o / Vanê,
‘sona dîyarê dewanê tirkan / Bayremê tirkan o’ / Vanê ‘no wo kîşîyo begê **Kir-
mancan** o’”.⁴⁸

Na kilame/lawike serdarê eşîra Bextîyaran Şahan Axayî ser o vajîyaya:

“Sahan Axayê mi merdo nêmerdo / Şikîyo tilsimê **Kirmancîye**...” (Sahan
Axa)⁴⁹

Na lawike de bi fekê Xidê Alê Îsme qirrkerdişê Dêrsimî yê 1937-38 yeno
îfadekerdiş:

“Bira, Xidir vano: / No kelepurrê ma / wertê **Kirmancîye** de / Çira hende
bîyo ucuzî”⁵⁰ (Lawika Xidir Axayî)

Pîlê eşîra Kurêşan ra Pîr Usênê Seyîdî, 1937 de Xarpêt de Seyîd Rizayî
reyde amebi dardekerdiş. Na kilame ey ser o vajîyaya:

“Hêfê mi yeno ve Sey Usenî rê / Heqê dina cor vêneno ke reîsê **Kirmancî**
yo”⁵¹

Qemero Areyiz yew kilama xo de wina vano:

“[Mi] hatirê xo wast bînû tever, / Verê çêverî de guret mi ra, / Tirkonê Ana-
dolîye, / Des hot mordemî danê zû mordem ro, / Tey çin o şeref û camêrdîye.
/ Mi va: ‘Heqo, nika bivîyêne / Naza çor xortê **Kirmancîye**, / Ma ve sima ra
pêro dênê, / Sarî bidîyene kerden û camêrdîye.’ (...) Mi va / ‘Najnî, mi ra çi wa-
zena? / To de çin o gonî-qeyretê **Kirmancîye**’...”⁵²

Şaîra dêrsimije Wakile (1900-1980) wina vana:

“Dêsim welatê **Kirmancî** yo / Tenga sey Riza û seda Sêy Qajî yo”⁵³

⁴⁷ Munzur Çem, Dersim Merkezli Kürt Aleviliği, Vate Yayınları, İstanbul 2009, r. 630

⁴⁸ Munzur Çem, Dersim Merkezli Kürt Aleviliği, Vate Yayınları, İstanbul 2009, r. 627

⁴⁹ Munzur Çem, Hawara Dêrsimî, Weşanên Deng, İstanbul 2003, r. 197

⁵⁰ Munzur Çem, Hawara Dêrsimî, Weşanên Deng, İstanbul 2003, r. 264 û Dersim Merkezli
Kürt Aleviliği, Vate, 2009, r. 629

⁵¹ Munzur Çem, Dersim Merkezli Kürt Aleviliği, Vate Yayınları, İstanbul 2009, r. 629

⁵² Hawar, “Çend Lawikê Qemê Arêyizi”, Berhem (kovara lêkolinên civaki û çandi), Stockholm,
No: 3 (İlon 1988), r. 59 ra neql: Malmîsanij, Kird, Kirmanc, Dimilî veya Zaza Kürtleri, Deng Yayın-
ları, İstanbul 1996, r. 5-6

- Reyna biewnî: Konferansê Zanistî yê Zonê Kurdî ser o Lerzan Jandîlî de roportaj – I, Dêr-
simInfo, <http://dersiminfo.com/konferanse-zanisti-ye-zone-kurdki-ser-o-lerzan-jandili-de-roportaj/>

⁵³ Daimi Cengiz, Dizeleriyle Tarihe Tanık Dersim Şairi Sey Qajî, Horasan Yayınları, İstanbul
2010, r. 190

Nuştoxoyê dêrsimij Zilfî nuşteyê xo “Ferhengekê Dimilkî-Kurmancî-Tirkî” de manaya çekuya “kirmanc”î wina dano: “Kirmanc (n): Kurmanc: Kurmanc veya Kürt”; “Kirmanciye (m): Kurmancîti: Kürtlük”⁵⁴

Goreyo ke Malmîsanij neql keno, nuştoxoyê dêrsimij Mustafa Duzgun derheqê na babate de wina vano: “Şarê Dêrsimî hetê nesebî ra xo ra kirmanc vano, sewbîna nameyan nêgurêno. Mavajî, merdimêko xerîb yan zî merdimêko dêrsimij nîyo, bêhemd ey ra ‘zaza’ vajo, dêrsimij ey ra cigîrîyeno, vano ‘ney, ez zaza nîyo, kirmanc o.’ Rastî wina ya ke kirmancê dêrsimijî xo ra qet ‘zaza’ nêvanî. (...) Reyna şarê Dêrsimî herra/erdê kalikanê xo, welatê kirmancan bi ‘Kirmancîye’ name keno. La bi tirkî yan zî bi sewbîna ziwanî wexto ke welatê xo ra behs bikî ‘Kurdistan’ vanî. Mesela, şaîr, zanaye û qehramanê Dêrsimî Elîşêr ‘Dersim Türküsü’ de çekuya ‘Kürdistan’ şuxulneno.⁵⁵ Reyna kirmancê dêrsimijî semedê azadîya Kürdistanî, telegraf û dilekçeyê ke Ewrûpa û Tirkîya rê şirawitî hemîne de welatê xo bi “Kurdistan” name kerdo. Dêrsim de çekuyê ‘Kirmancîye’ û ‘Kurdistan’î mîyan de tu ferqêk çin o. Reyna Dêrsim de nameyê welatî yan çekuya ‘Kirmancîye’ yan “Kurdistan’ tena semedê Dêrsimî ney, wazeno wa ‘Kirmanc bo, wazeno wa ‘zaza’ bo, wazeno wa ‘kur’ yan ‘kurd’ bo, semedê welatê heme kurdan yeno xebetnayîş.”⁵⁶

Munzur Çem, yew roportajê xo de vano ke “Rojhelatê Dêrsimî de merdim hertim eşkeno vatişanê sey ‘kirmancê Erzurumî’, ‘kirmancê Muşî’, ‘kirmancê Dîyarbekirî’ bieşnawo.”⁵⁷

Pîr Riza Yagmûr zî roportajê xo de çekuya *kirmanc* manaya heme kurdan de gurêno:

“Kirmanco 29 reyî sere dardo we, Çiqa ke sere dardo we kirmanco, alewîyê xo cîya findetê, safiyê xo cîya findetê. Hama na peyên de se kerdo? Alewîyî, safiyî, hatta tirkî werte de yê.”⁵⁸ Reyna, sewbîna cayan de tebîrê “elewîyonê kirmancû” zî şuxulneno û merdim roportajê ey ra bi eşkera fam keno ke hem sunî hem zî elewî kirmancî estî.⁵⁹

⁵⁴ Zilfî, “Ferhengok: Dimilki-Kurmanci-Tirki”, Hêvî, Hejmar 1, Parîs, Îlon 1983, r. 113

⁵⁵ “Kahramanı çoktur kılınc takınır / Bütün Kürdistan’a yardım dokunur / Havariçler yedi devlet sakınır / Allah’tandır kavi beli Dersim’in” (Daimi Cengiz, Dizeleriyle Tarihe Tanık Dersim Şairi Sey Qajî, Horasan Yayınları, İstanbul 2010, r. 183)

⁵⁶ M. Dûzgûn, “Torêy ve Adetê Dersimî”, Berhem (kovara lêkolinên cıvaki û çandî), Stockholm, No: 1 (Şubat 1988), r. 37 ra neqlkerdox: Malmîsanij, Kird, Kirmanc, Dimilî veya Zaza Kürtleri, Deng Yayınları, İstanbul 1996, r. 4

⁵⁷ Zazaki.org, “Munzur Çem ile Röportaj”, <http://www.zazaki.org/modules.php?name=News&file=article&sid=17>

⁵⁸ “Pîr Riza Yagmuri de îtiqad ser o (Qisimo 1.)” <http://dersiminfo.com/pir-riza-yagmuri-de-itiqad-ser-o-qisimo-1/>

⁵⁹ “Pîr Riza Yagmuri de îtiqad ser o (Qisimo 3.)” <http://dersiminfo.com/roportaj-pir-riza-yagmuri-de-itiqad-ser-o-qisimo-3/>

Tayê cayanê elewîyan de çekuyê “kirmanc” û “elewî” hetê mana ra biyî yew. Munzur Çem, derheqê manaya çekuya “kirmanc”î de nê tespîtan wina sererast keno:

“Zafê cayanê Dêrsimî de ‘kirmanc’ tena ê ke lehçeya kirmanckî (zazakî) qisey kenî înan temsîl nêkeno. Rojhelatê Dêrsimî de elewî bo, sunnî bo kurdê ke bi kurmanckî qisey kenî, ê zî wina name benî. Bi no hewa no name, seba qiseykerdoxanê her di lehçeyan nameyêko muşterek beno. Labelê îstîsnaya naye, rojawanê Dêrsimî, Sêwas û Qeyserî yê. Uca de kurdê elewî xo ra ‘kirmanc’ vanî, labelê tirk yan zî kurd ferq nêkeno sunnîyan ra ‘tirk’ vanî. Bi vatişo bîn, ziwane înan de elewîyîye kurdîye de, sunnîyîye zî tirkîye de bîya yew. Kirmancîye zî kurdîye û Kurdîstanî îfade kena.”⁶⁰

Mebusê tirkan û serekê TBMM Abdulxaliq Renda, serra 1925î de bajarane kurdan ra gêreno û raporêk amade keno. O rapor de têkîlîya “kurdîye” û “elewîyîye” wina îzeh keno: “Tesîrê muhîti hende zaf o ke Elezîz û Çemîşgezêkî mîyan de dormaleyê Gumrukhanê Ezatî de panc-şeş dewî estî ke bêxeyca tirkî tu ziwane nêzanî; labelê semedo ke elewî yî, vanî ke ma kurd î”⁶¹

Yewna manaya sosyolojîke zî na ya ke tayê cayan de *kirmanc/kurmanç*, şêx, pîr, beg, axa ra teber semedê şarê dewijî, yanî tebeqeya bêstatuye rê zî yeno vatiş. Derheqê naye de sosyolog İsmail Beşikçi vano ke “Kirmanç, kurd o. Labelê feodalê şerqî xo kirmanç qebûl nêkenî.” Goreyê Beşikçi, senî ke wextê Osmanîyan de tirkmen bêqîymet bi, labelê dewrê neteweperwerîye de qîymet girewt, eke kurdî newtewebîyayîşê xo tamam bikî do kirmanc zî qîymet bigîro.⁶²

Telafuzê “kurmanç” zî tayê cayan de eynî mana de vajîyeno. Mesela, Salmas û Urmîye de mîyanê kurdan de kesê ke mensûbê eşîrêk nêbî û karê zîreat û cite bikî, înan ra “kurmanç” vajîyeno.⁶³ İhsan Nûrî zî ney tesdîq keno: “Kurdîstan de hetê Rizaîye û Şahpûr de kesê ke mensûbê eşîre bî, xo ra kurd vanî; kesê ke citêrî bî, înan ra zî ‘kurmanç’ vanî. Nê kurmançî zî xo ra kurd vanî. Nê eşîrî xo miletê kurdî ra beşa kurmancan ra hesebnenî, la hetê ziwane, kultur û edetî ra beyntarê înan û ê bînan de ferq çin o.”⁶⁴

⁶⁰ Munzur Çem, Dersim Merkezli Kürt Aleviliği, Vate Yayınları, İstanbul 2009, r. 552

⁶¹ Mehmet Bayrak, Kürtler ve Ulsual Demokratik Mücadeleleri, Öz-Ge Yayınları, r. 453 ra neqlkerdox: Munzur Çem, Dersim Merkezli Kürt Aleviliği, Vate Yayınları, İstanbul 2009, r. 312

⁶² İsmail Beşikçi, Doğu Anadolu'nun Düzeni, Sosyo-Ekonomik ve Etnik Temeller, 3. Basım, C. I, Yurt Kitap -Yayın, Ankara, 1992, r. 191 ra neqlkerdox: Malmîsanij, Kird, Kirmanc, Dımılı veya Zaza Kürtleri, Deng Yay., İstanbul 1996, r. 9

⁶³ Perwîz Cihanî, "Kurmanç Kî ne?", Sırwe (gowari edebi-ferhengi), Urmiye, No: 16 (Xezelwer 1366), r. 64 ra neql: Malmîsanij, Kird, Kirmanc, Dımılı veya Zaza Kürtleri, Deng Yayınları, İstanbul 1996, r. 9

⁶⁴ İhsan Nûrî, Kürtlerin Kökeni, Tercume: M. Tayfun, Doz Yay. İkinci Baskı, İstanbul, 1991, r. 115

Ehmedê Xanî kitabê xo *Mem û Zîn* de qismê sebebê telîfî (sebebê nuştîşî) de “kurd” û “kurmanc” pêdiman eynî mana de şuxulneno.

“Da xelq nebêjtin ku: **Ekrad**⁶⁵ / Bê ma’rîfet in, bê esl û binyad / Enwaê mîlel xwedan kitêb in / **Kurmanc** tenê di bêhesêb in”⁶⁶ (Wa şar nêvajo ke: Kurdî / bê merîfet, bê esl û bê binge yî / Zaf miletî wayîrê kitabî yî / Tena kurmancî bêhesab î – BZ)

Tayê nusxeyanê *Mem û Zîn* de na çekuye sey “kirmanc” nusîyaya.⁶⁷

Çekuya “kirmanc”, kurmancanê Tirkîya mîyan de hîna zaf sey “kurmanc” la mintiqaya Behdînan de hawayê dêrsimijan sey “kirmanc” telafuz bena.⁶⁸ Reyna tayê kurdê Başûrî zî semedê xo “kirmanc/kirmanç” lehçeya xo ra zî “kirmancî xwerû”, kurmancîya Vakûrî ra zî “kirmancî serû” vanî. Akademîya Kurdî ya Bexdadî zî lehçeyanê Kurdîstanê Îran û Îraqî ra “kirmanciya xwarû” û lehçeya kurdanê Tirkîya ra zî “kirmanciya serû” vana.⁶⁹ Sorankî de telafuzê çekuye sey “kirmanc/kirmancî” yo. Mesela, yew rojnameyo ke 1926-1930 de bi sorankî weşanîyayo, nameyê ci “Zarî Kirmancî” yo.⁷⁰ Ferhengê Îzolî de zî çekuya “kirmanc” û “kurmanc” telafuzê yewbînan î.⁷¹ Goreyo ke Malmîsanij Ferhengê Xalî ra neql keno, şîweya Erdelanî de “kirmanc” sey “kirmac” vajîyeno.⁷²

Papazê armenîyan ra Bogos Natanyan zî raporê xo de (1878) semedê kurmancan çekuya “kirmanç” şuxulneno. Goreyê Natanyanî “şarê Palî, armenî, tirk û kurdan ra mûteşekkîl o. Kurdî zî di qisim î: zaza û kirmancî.”⁷³

Seke ma destpêk de behs kerd bi şarê Modanî (Motkî) xo ra “kirmanc” ney “kurmanc” vano, la zîwanê xo ra “dimilî” vanî. Roportajê Îshaq Tepeyî na babetê de balkêş o:

“- Şîma bi xo, xo çî hesabnenî?

- Ma xwi ra vanê kurmanc.

- Şîma vanî kurmanc? Şîma nêvanî ‘dimilî’?

- Wextê ku vacê ‘Zan’ tu çîba [çî] wo?’, ma vanê ‘dimilî’. Wextê ku vacê ‘Pekî

⁶⁵ “Ekrad” erebkî de zafhûmarîya çekuya “kurd” a.

⁶⁶ Ehmedê Xanî, *Mem û Zîn*, Amadekar: M. Emîn Bozarslan, Gün Yayınları, 1968, r. 61

⁶⁷ Ehmedê Xanî, *Memozîn*, Transkrîpsiyon: Arîf Zêrevan, Nefel, Stockholm, 2004, r. 45

⁶⁸ Malmîsanij, *Kird, Kirmanc, Dimilî veya Zaza Kürtleri*, Deng Yayınları, İstanbul, 1996, r. 8

⁶⁹ “Pirsên alfabeja kurdî”, Hêvî, kovara çandîya giştî, No: 1, Parîs, Ilon 1983, r. 9

⁷⁰ Amir Hassanpour, *Kürdistan’da Milliyetçilik ve Dil (1918-1985)*, Tadayoxî: İbrahim Bingöl & Cemil Gündoğan, Avesta Yayınları, İstanbul 2005, r. 78 û r. 347-350

⁷¹ D. İzolî, *Ferheng: Kurdi-Tirki, Türkçe-Kürtçe*, Deng Yayınları, İstanbul, 1992, r. 237

⁷² Mihemedî Xal, *Ferhengî Xal*, C. III, Çapxaney Kamerani, Silêmani (Süleymaniye), 1976, r. 83 ra neql: Malmîsanij, *Kird, Kirmanc, Dimilî veya Zaza Kürtleri*, Deng Yayınları, İstanbul 1996, r. 8

⁷³ V. Bardizaktsi, B. Natanyan, K. Srantsyants, *Dersim Gizemi*, Palu-Harpût 1878, 2. Cilt, Derlem Yay., İstanbul, 2010, r. 144

milet olereq ti çiba yî?', ma vanê 'kurmanc'. Ma nêvanê 'Ez dimlî ya', yen [yan] zî 'Ez zaza ya'; ma vanê 'Ez kurmanc a'. Lê ma nêvanê 'Ez kurmancî mijûlîyena', ma vanê 'Ez dimlî mijûlîyena'. Ma hete qet kes nêvano 'zaza' yen zî 'Zazakî'."⁷⁴

2.3. Dimilî

Kirdê ke Çermûge, Şankûş, Sêwregi, Gerger û Şîro de ciwîyenî xo ra "dimilî", ziwane xo ra zî "dimilî" yan zî "dimilkî" vanî. Zafane, nê cayan de "dimilî" hem nameyê şarî hem zî nameyê ziwani ifade keno.⁷⁵ Dimilî cirananê xo kurmancan ra *kirdas*, ziwane înan ra zî *kirdasî* yan *kirdaskî* vanî. Nameyê "dimilî" hetê kurmancan ra zî semedê heme kurdanê zazayan yeno şuxulnayîş.

2.3.1. Derheqê Kokê Çekuya "Dimilî" de

Derheqê kokê nê nameyî de çend teorîyê cîyayî estî. Goreyê yew teorîye çekuya *Dimilî* eslê xo de *Deylem* ra yena. *Deylem*, vakûrê Îranî de mîyanê behrê Hezarî û Qezvînî de nameyê mintiqayêka koyî yo.⁷⁶ Şaro ke na mintiqaya de ciwîyayo înan ra *Deylemî* vajîyayo. La wextê Buweyhîyan de (seserra 10.) sînore *Deylemî* binê behrê Hezarî heme girewtbi xo mîyan.⁷⁷ Goreyê na teorîye, eslê dimilîyan *Deylem* ra yeno û ziwane înan zî ziwane *Deylemî* ra yeno. Dima vengê *I* û *m* ca vurnayo, name meqlûb bîyo û sey *Dimilî* ameyo vatiş. Goreyo ke G. Asatrian behs keno, armenîyan mîyan de dimilîyan ra sey "dlmik" zî vajîyeno. Goreyê Asatrîanî "dlmik" têkilîya *Deylemî* îşaret kena.⁷⁸ F. C. Andreas, O. Mann, K. Hadank û V. Mînosrky na teorîya "*Deylem*"î mudafaa kerda.⁷⁹ Tayê nuştoxê bînî ke dima amey, înan zî nuşteyanê xo de ca dayo na teorîye.⁸⁰

Mehrdad R. Izady têkilîya dimilîyan û *Deylemî* bi ewnîyayîşêko cîya wina îzeh keno:

"Derheqê kokê etnîsîteyê *deylemîyan* û bitaybetî demanê bînan de derheqê vurîyayîşê etnîsîteyê înan de zelalîyêk çin a. *Deylemî* (dîlamî) wextê îslamî de cêrê behrê Hezarî de koyanê Elbrûzî de vejîyaybî meydan. Labelê

⁷⁴ Malmîsanij, "Derheqê Kirmancanê Modanî (Motkanî) de", Vate: Kovara Kulturî, Numre 32, r. 74

⁷⁵ Fahri Pamukçu, Gramerê Zazakî, Vejîyayîşê Tîjî, İstanbul 2011, r. 31

⁷⁶ *Deylem* nika Îran de eyaletê Gîlanî mîyan de yo.

⁷⁷ Tahsîn Yazıcı, "Deylem", Türkiye Diyanet Vakfı İslam Ansiklopedisi, C. 9, TDV, İstanbul 1994, r. 263-264

⁷⁸ Garnik S. Asatrian & N. Kh. Gevorgian, "Zaza Miscelanny, Notes on some religious customs and institutions.", Acta Iranica, Volume XII, Belgium 1988, r. 500

⁷⁹ Karl Hadank, Mundarten der Zâzâ, hauptsächlich aus Siverek und Kor, Berlin 1932, r. 4-6

⁸⁰ Garnik Asatrian, "Dimlî", Encyclopedia Iranica, <http://www.iranicaonline.org/articles/dimli>

wexto ke rêça înan hetanî verê dewrê îslamîyetî teqîb bibo, kokê înan reseno vakurê çemê Dicle ke nika tede tornê înan yê modernî kurdê dimilî (zazayî) ci-wiyenî. Kitabê zerduştîyan ra *Bundahîşn*, dîlamanî hetê behrê Hezarî de ney, hetê vakurê Dicle de nawneno. Qeydê Kilîseyê Arbelayî (Hewlêr) zî vakurê Sîncarî de (cayo ke çimeyê Dicle yo) *Beth Dailomaye* ra yanî welatê deyleman ra behs keno. Strabon (Cografya, XVI.i.1) û Tacîtus (Serebûtê Tarîxî, VI.xliv) zî şar û welatê Dolomene/Delymaie Kurdîstan de, cayo ke awa Dicle vejîyena uca de nawnenî. (...) Tarîxnas Ebûl Fîda, wexto ke kokê etnîsîteyê deylemîyan de çend teorîyan munaqeşe keno, têkîlîya înan û kurdan hîna maqûl vînen. (...) Nika zî dormaleyê koyanê Elbrûzî de tayê kurdî estî ke hetê bawerî ra yaresanî yî, labelê nê kurdî demanê peyînan de ameyî ewta, la reyna zî no nawneno ke ewta tarîx ra nat maruzê koçê kurdan bîyo.”⁸¹

Goreyê fikrê Izady eslê deyleman kurd o, û înan ra qismêk Mezopotamaya corêne ra koç kerdo şîyê cêrê behrê Hezarî, la dima hetê etnîkî ra xilt bîyî û vurîyayî, derheqê nê vurîyayîşê etnîkî de çimeyî zelalî çin î. M. Emîn Zekî Beg zî Hamzatul Îsfahanî û Îskender Munşî ra qala “Deylemî yew eşîra kurdan a” neql keno, labelê bi ihtîyat ewnîyeno.⁸²

Teorîya Deylemî bingeyê xo hîna zaf bedelnayîşê vengana ra gêna. La hema hetê tarîxî ra derheqê têkîlîya çekuya “dimilî” û “Deylemî” de delîlêko zelal nê-vejîyayo meydan.

Hetê kokê çekuye ra sewbîna fikrê cîyayî zî estî. Goreyê tayê nuştoxan kokê kurdan eslê xo de reseno di eşîranê girdan. Nê eşîrî *Zil û Mil î. Dimilî* zî çekuyanê *dum û mel* ra yena pê; manaya xo “dimê Mil”î yo; yanî eslê xo *Mil* ra yenî.⁸³ Goreyê tayênan na eşîre seba ke demeyêk tabîê eşîra Milî bîya coka înan ra “Du-Milî” vajîyayo, yanî “dimê eşîra Milî.”⁸⁴ Goreyê teorîya bîne zî kelîmeya “dimilî”, eşîra *Dinbilî* ra yena. Qaso ke *Şerefname* de behs beno, “dimbilî” yew eşîra kurdan a ke eslê înan Botan ra yo. Demeyêk Xoy, Sekmenabad, Şemdînan, Hekarî, Kotur, Bargîrî û Çaldiran de hukim kerdo.⁸⁵

Telafulzê na çekuye tarîx de sey “dunbulî, dumbulî, dinbilî, dimbilî, dumilî û dimilî” cîya-cîya vîyareno. Nê telafulzê cîya-cîyayî wendişê herfanê erebkî “دنبند” (d-n-b-l-y) ra yenî. Wina aseno ke kokê çekuye “dunbulî/“dinbilî” yo û

⁸¹ Mehrdad R. Izady, *Kürtler Bir El kitabı*, Doz Yayınları, İstanbul 2004, r. 103-105

⁸² Îskender Beg Munşî, *Alemara-yi Abbasi Cilt:3*, r. 712 ra neql: M. Emîn Zekî Beg, *Meşahîr-î Kurd û Kurdîstan (Kürd ve Kürdistan Ünlüleri)*, Çev. M. Baban, M. Yağmur, S. Kutlay, Stockholm 1998, r. 11

⁸³ Süleyman Sabri, *Van Tarihi*, r. 43 ra neql: Dr. Mahmut Rışvanoğlu, *Doğu Aşiretleri ve Emperyalizm*, 3. Baskı, Türk Kültür Yay., İstanbul, 1978, r. 94 ra neql: Malmîsanij, *ecv*, r. 11

⁸⁴ Kemal Badıllı, *Türkçe İzahlı Kürtçe Grameri (Kürmançça Lehçesi)*, Ankara, 1965, r. 6

⁸⁵ Şeref Xan, *Şerefname*, Tadayox: M. Emin Bozarslan, Hasat Yayınları, İstanbul 1990, r.

vengê na çekuye sey “nb > nm > m” bedelîyayo bîyo “dimilî”. No tewir bedelîyayîşê vengan kirdkî de esto. Nimûne:

“şenbe > sembe > şeme”, “sinbore > simbore > simore”, “tenbel > tembel > temel”⁸⁶

Bedelîyayîşê nê vengan sewbîna ziwanan de zî esto. Mavajî, erebkî de goreyê qaydeyê wendişî, eke herfê *nb* tédima bîyê sey *mb* wanîyenî. Sey “leyunbezenne > leyumbezenne.”⁸⁷

Goreyo ke Malmîsanij neql keno dormeleyê Motkî û Sasonî de semedê zazayan “dimbilan” vajîyeno (-an îzafeyê zafhûmarîye yo).⁸⁸ Sewbîna çimeyî zî eşkera kenî ke “dunbulî/dinbilî” û “dumilî/dimilî” eynî yî. Ma do cêr de çimeyanê tarîxîyan ra nê nimûneyan rêz bikî.

2.3.1. Çimeyanê Nuşteki û Fekkîyan de “Dimilî”

Goreyo ke tarîxnas Wisif Zozanî neql keno, “reya verêne Ebû Henîfe Dî-nawerî (820-895) behsê “dunbulîyan” kerdo. Ebû Henîfe kitabê xo *Ensab’ul Ekrad* (Nesebê Kurdan) de behsê dunbilîyan keno û eslê dunbulîyan resneno Emîr Îsayî. Şerefxan zî *Şerefname* de eynî malumatî dano. Dî-nawerî, wexto ke *Kitabu’n-Nebat* de nebatatê Kurdîstanî ra behs keno bi nameyê *Gendala* yew dare ra behs keno û vano ke na dare hîna zaf Bîlad’ud Dunbul (Dîyarê Dunbulîyan) de esta. Dima vano ke, dunbulî bi na dare çermeyanê xo debax kenî, qalîkê dare zî wişk kenî, tehnenî û dima birînê ke fekê heywanan de vejîyenê, semedê înan sey darû şuxulnenî. Çîyo balkêş na dare hema zî mintiqaya zazayan de sey “gendar” yena zanayîş û heta nê demanê peyînan zî semedê debaxkerdişê meşkan û birînê dewaran ameyênî şuxulnayîş.⁸⁹

Dima, tarîxnas Mesûdî (896-956) *ed-Denabîle* (zafhûmara çekuya *dunbilî*) ra behs keno ke na qebîle Sûrîye de ciwîyena.⁹⁰

Muhaddîs Ebû Tahîr es-Silefî (1080-1180) kitabê xo *Mu’cemu’s Sefer* de dersa hedîse de nameyê seydayê xo *Ridwan bin Îbrâhim bin Memlân ed-Dunbuli el-Kurdî* dano. Seke aseno ewta de “dunbulî” qebîleyêka kurdan a.⁹¹ Se-lefî, eynî kitabê xo de behsê yewna alimî zî keno ke kunyeya ey “Deylemî” ya.

⁸⁶ Malmîsanij, Kird, Kırmanc, Dımili veya Zaza Kürtleri, Deng Yayınları, İstanbul 1996, r. 14
- Biewnî: Grûba Xebate ya Vateyî, Ferhengê Kirmanckî (Zazakî)-Tirkî, Wesanxaneyê Vateyî, İstanbul 2009, r. 624

⁸⁷ No qaydeyê tecwîdî ra “îqlab” vajîyeno, sey “mîn badî > mim badî.”

⁸⁸ Malmîsanij, Kird, Kırmanc, Dımili veya Zaza Kürtleri, Deng Yayınları, İstanbul 1996, r. 11
89 Wisif Zozanî, Dünbülîler, Zazalar yahud Kirdler (meqaleya nêweşanîyaye)

⁹⁰ Arşak Poladyan, VII.-X. Yüzyıllarda Kürtler, Çeviren: Mehmet Demir, Özgür Gelecek Yayınları, Ankara, 1991, r. 92 ra neql: Malmîsanij, Kird, Kırmanc, Dımili veya Zaza Kürtleri, Deng Yayınları, İstanbul 1996, r. 12

⁹¹ Wisif Zozanî, “Dünbülîler, Zazalar yahud Kirdler” (meqaleya nêweşanîyaye)

Ma ewta ra zî fam kenî ke “dunbulî” û “Deylem” di çekuyê cîya yî, yanî kokê çekuya “dunbulî” “Deylem” ra nêna.

Goreyo ke tarîxnas Wisif Zozanî neql keno, “Tarîxnasê seserra 12. ra İbnul Ezraq el-Fariqî, kitabê xo *Tarîxê Meyafarqîn û Amîd* de qismê Merwanîyan de bi nameyê Ebdürrehman bîn ebî'l-Werd ed-Dunbulî behsê yew serdarî keno.”⁹² No zî nawneno ke Dunbulî na seserre ra pey tay bî zî ameyî mintiqaya xo ya nikayîne.

Alimê nesebî İbn Nûqta el Hanbelî (1183-1231) kitabê xo *Tekmiletu'l-İkmal* de dunbulîyan ra behs keno. Na qebîla ra nameyê di aliman vano ke nesebê nê aliman reseno Musul. No zî nawneno ke Musul seba dunbulîyan welatêko qedîmî bîyo.⁹³

Tarîxnaso namdar Zehebî (1274-1348) *Muştêbihu'n Nisbe* (Nesebê Pêmanayeyî) de vano ke “Dunbulî yew eşîra kurdan a û hetê Musulî de ciwîyena.”⁹⁴

Fadlullah İbnul-Umerî Şehabuddîn Ehmed (1301-1349), kitabê xo *Mesaliku'l-Ebsar* de na çekuye sey “dunbulî” nuseno û cayê înan vakûrê rojhelatê Musulî de koyê Meqlûbî nawneno.⁹⁵

Fîrûzabadî (1329-1414) zî ferhengê xo yo namdar *El-Qamusu'l-Mûhît* de rastnuştîşê çekuye sey “dunbul” nawneno û vano ke “*Dunbul* nameyê yew eşîra kurdan o ke verê cû hetê Musulî de ciwîyayêne. Faqîyê Şafîî Ehmed b. Nasr û muheddîs Elî b. Ebû Bekr b. Suleyman Dunbulîyan ra yî.”⁹⁶ Tarîxnasê Memlukîyan ra Maqrîzî (1364-1442) zî dunbulîyan sey qebîleyêka kurde qeyd keno.⁹⁷

Seke aseno nê çimeyanê rewênan de welatê dunbulîyan der û dorê Musulî de aseno. La dima wina aseno ke dunbulîyan ra qismêk koç kerdo şîyî vakûr û hetanî Azerbeycan vila bîyê.

Şerefyan (1543-1603) *Şerefname* de vano ke “*Dinbilî* yew eşîra kurdan a. Eslê înan Botan ra yo û înan ra “Dunbulî Boxt” vajîyayo. Demeyêk Xoy, Sekmenabad, Şemdinan, Hekarî, Kotur, Bargîrî û Çaldiran de hukim kerdo. Dinbilî

⁹² Wisif Zozanî, “Dünbülîler, Zazalar yahud Kirdler” (meqaleya nêweşanîyaye)

⁹³ Roşan Lezgîn, “Dimilî/Zazaki ve Zazalar Üzerine”, <http://www.zazaki.net/haber/dimiliza-zaki-ve-zazalar-uzerine-979.htm>

⁹⁴ Zeki Alimoğlu, “Zazaca Kürtçenin Bir Lehçesidir”, <http://www.zazaki.net/haber/zazaca-kurtcenin-bir-lehcesidir-721.htm>

⁹⁵ M. Emin Zeki, Xulasetu Tarixu'l-Kurd we Kurdistan Min Eqdemi'l-'Usûri'l-Tarixiyye Hettel'l-An, Arapçaya Çeviren: Muhammed 'Elî 'Ewnî, C. I, İkinci basım, 1961, r. 368 ra neql: Malmîsanij, ecv., r. 12

⁹⁶ Mecdeddîn Yakûb Fîrûzabadî, *El-Qamusu'l-Mûhît*, C. 3, Misir 1979, r. 366

⁹⁷ Wisif Zozanî, “Dünbülîler, Zazalar yahud Kirdler”, (meqaleya nêweşanîyaye)

verê cû êzîdî bî, dima bîy musulman.” *Şerefname* de derheqê beganê dinbilîyan de gelek malumat esto.⁹⁸ Goreyê çimeyan wextê Safewîyan de bi serekîya Suleyman Xanî qismêkê dunbilîyan meylê şîîtiye kerdo. Sewbîna çimeyan de zî behs beno ke demê Emîr Behlulî de bîatê Şêx Heyderê Safewî kerdo û bîyî şîî.⁹⁹

Dunbulîyê ke nika Îran de ciwîyenî hetê zıwanî ra asîmîle bîyê û azerkî qisey kenî.¹⁰⁰ Begê dinbilîyan bi xo tarîxê xo nuşto. Mesela, Ebdurrezaq Xan Dunbulî 1850 de *Tarîxê Denabîle* (Tarîxê Dunbulîyan) de kokê dunbulîyan resneno bermekîyan.¹⁰¹ *Asarîi Şîiye El-Îmamîye* de zî behs beno ke bermekî eşîra dunbulî ra yî.¹⁰² Dunbulîyê Îranî nika keyepelê *donboli.info* ser o derheqê tarîxî xo de malumat danî û eslê xo kurd vînenî.

Ewlîya Çelebî (1611-1682) zî *Seyehatname* de hukimdarîya dunbulîyan ra behs keno û vano ke rojawanê gola Urmîye de Qela Dunbulîyan esta. Wextê Osmanîyan de Defteranê Tehrîrî de dunbulî zî qeyd bîyê. 1577 de yew emîrnameyê Osmanîyan de dinbilîyan ra sey taîfeyêkê kurdan behs beno.¹⁰³

Yew şîira Ehmedê Xanî (1651-1707) de zî semedê “dunbul”î “dumil” vajî-yeno. Beno ke neqlkerdoxî çekuya “dunbil” sey “dumil” nuşta. Labelê her halûkar de no nawneno ke çekuyê “dimilî” û “dunbulî” telafuzê yewbînan î. Qismê na şîire wina yo:

“Mizgîn me hatî xweş xeber, Xan Murteza bûye serwer / Şah û serdarê Kurdistan, ji dil derxistin ew keder / (...) Çi Osmanî çî Sefewî, her du gohdarêd pendêd wî / Emn û parizîya merzê wî, karî dikir hemî li ber / Dadvan bû ew hemî deman, **Dumil**, Mehmûd û Sipîkan / Xanî, Mehend hemî Kurdan, peymangir bûn ji bo serwer”¹⁰⁴

Na şîire semedê Murteza Qulî Xan Dunbulî nusîyaya. Murtaza Xan, dewrê Şah Ebbasê diyinî (1642-1666) û Şah Suleymanê yewin (1666-1694) de begê

⁹⁸ Şeref Xan, Şerefname, Tadayox: M. Emin Bozarslan, Hasat Yayınları, İstanbul 1990, r. 345-353

⁹⁹ Murat Alanoğlu-Muhammet Yücel, “Dimli-Zaza adı ve Tarihsel Gelişimi”, 1.Uluslararası Zaza Dili Sempozyumu (13-14 Mayıs 2011), Bingöl üniversitesi Yayınları, Ankara 2011, r. 315

¹⁰⁰ Donbolî, <http://www.iranicaonline.org/articles/donboli-1>

¹⁰¹ M. Emîn Zekî Beg, Kürtler ve Kürdistan Tarihi, Terc. V. İnce, M. Dağ, R. Adak, Ş. Aslan, Nûbihar, İstanbul 2011, r. 712

¹⁰² M. Emîn Zekî Beg, Meşahîr-î Kurd û Kurdistan, Terc. M. Baban, M. Yağmur, S. Kutlay, Stockholm 1998, r.11

¹⁰³ Murat Alanoğlu-Muhammet Yücel, “Dimli-Zaza adı ve Tarihsel Gelişimi”, 1.Uluslararası Zaza Dili Sempozyumu (13-14 Mayıs 2011), Bingöl üniversitesi Yayınları, Ankara 2011, r. 323

¹⁰⁴ Ebdullah M. Varlî, Dîwan û Gobîdeyê Ehemdê Xanî yêd Mayîn, İstanbul 2004, r. 109

¹⁰⁵ Ebdullah M. Varlî, Dîwan û Gobîdeyê Ehemdê Xanî yêd Mayîn, İstanbul 2004, r. 109

- Cemil Rojbeyani, Femandarîya Dumbulîyan li der û dora Tebrîzê, <http://aso-zagrosi.over-blog.com/article-30477740.html>

- “Emîr Murteza Qulî Xan Dunbulî”, <http://www.donboli.info/morteza-goi-khan.htm>

dunbilîyan bîyo.¹⁰⁵

Elî Ekber Dehxuda (1879-1956) *Lugatname* de vano ke “*Dunbul*, mintiqaya Diyarbekirî de nameyê yew koyî yo. Dunbulîyê Azerbayacanî eslê xo de na mintiqa ra yî. Kurdistan de sey dummel/zaza meşhûr î”.¹⁰⁶

Osman Sebrî mîyanê eşîranê êzidîyan de eşîra “domilî” zî hûmareno.¹⁰⁷ Goreyo ke Ehmedê Dirihî ma rê behs kerd, Koyê Şengalî de mîyanê êzidîyan de di eşîrê bîyê: *Zaza û Dimilî*. Zazayan uca ra bar kerdo, şîyî la dimilî hema zî estî. Înan ra Xidirê Dimilî Duhok de rojnamegerî keno.

Tayê çimeyî bînî zî estî ke têkilîyê dunbulî û zazayan nawnenî. Mesela, Peter Lerch, serranê 1850an de corê Palî de eşîra Dumbelî ra behs keno û nuseno ke na eşîre zazakî qisey kena.¹⁰⁸ Zîya Gokalp, neql keno ke “[Kurmançî] zazayan ra ‘dunbulî’ vanî.”¹⁰⁹ M. Şerîf Fırat, kitabê xo *Doğu illeri ve Varto Tarihi* (Tarîxê Wîlayetanê Şerqî û Vartoyî) de zaf cayan de çekuyanê zaza û *dumbelî* sey terkîbê *zaza-dumbelî* eynî mana de şuxulneno.¹¹⁰ Tayê cayan de zî sey “*Dumbelî Zazalar*” (zazayê dumbelî) gurênenno.¹¹¹ Seke ma cor de Malmîsnajî ra neql kerdbi dormeleyê Motkî û Sasonî de semedê zazayan “dimbilan” vajî-yeno (-an îzafeyê zafhûmarî yo). Reyna qaso ke Roşan Lezgîn neql keno, Licê de “rêzila koyê peyê (vakur) Licê ra wet, hetê Çewligî ser, hetanî ça şino nêno zaneyîş, kirdî vanê, “Kirdane” la kurmançî vanê, “Dimilya” yan zî “Dimilya”.¹¹² Nê malumatî eynî wext nawnenî ke *dimilî* û *dimbilî/dunbulî* telafuzê yewbînan î.

Mehemed Elî Ewnî wexto ke *Şerefname* açarneno erebkî, peynîya kitabî de şecereyê xo bi ziwanê erebkî nuşto. Kirdkîya nê nuşteyî wina ya: “Temam bi çarnayîşo bêkêmasî, tewr zeîfê qulanî Homayî, Mehemed Elî Ewnî lajê Ebdulqadir Ewnî Efendî û tornê Mehemed Elî Axayo Babij dest ra bîyo. Şarê Sêwregî ra, eşîrê **Dunbulî** yanî **Zaza** ra û milletê **Kurd** ra yo. Homa Teala eyi damê fesadan ra bipawo. Qahîre de ronîşte yo. No nuşteyê xo 15 Êlule serrê 1948

¹⁰⁶ M. Cemil Rojbeyani, “Fermanrewayiy Dunbuliyekan Le Tewrêz û Dewrûberî da”, Karwan, No: 32 (Mayisî 1985), r. 18 ra neql: Malmîsanij, ecv, r. 13

¹⁰⁷ Osman Sebrî, “Êzdî û Ola Wan-3”, Ronahî (Suplemen illustré de la revue Hawar), Hejmar 21, Şam, 1.12.1943, r. 15

¹⁰⁸ Malmîsanij, Kird, Kirmanc, Dimilî veya Zaza Kürtleri, Deng Yayınları, İstanbul 1996, r. 12

¹⁰⁹ Ziya Gökalp, Kürt Aşiretleri Üzerine Sosyolojik Tetkikler, Sosyal Yayınlar, İstanbul, 1992, r. 27

¹¹⁰ M. Şerif Fırat, Doğu İlleri ve Varto Tarihi, MEB, İkinci baskı, Ankara 1961, r. 10, 11, 24, 27, 55, 66, 125

¹¹¹ M. Şerif Fırat, Doğu İlleri ve Varto Tarihi, MEB, İkinci baskı, Ankara 1961, r. 67, 69

¹¹² Roşan Lezgîn, “Nameyê Dew û Mezrayanê Licê”, <http://www.zazaki.net/haber/namey-dew-mezrayan-lic-80.htm>

¹¹³ Şerefxan Bidlisî, Şerefname, trc. Mehemed Elî Ewnî, Dimeşq 2006, C. 2, r. 215 ra neql: Wisif Zozanî, “Asmênê Kirdan ra Estareyêko Nimite: Mehemed Elî Ewnî”, Nûbihar, Hûmare 118, C. 15, İstanbul 2012, r. 9

de nušto”¹¹³

Heto bîn ra kitabê *Meşahîrul-Kurd û Kurdistan* de sey cênotî derheqê dunbulîyan de vano ke, “Bi raştî no name qey yew şaxê kurdanê pîlî rê vajîyeno. Welatê Kurdistanî de vila bî. Şarî xerîbî înan ra vanî zaza.”¹¹⁴

Goreyê tayê çimeyan zî *donbolî* eslê xo de kurdê kurmanc î. Lajê Huseyn Xan Donbolî, Teymûr Paşa *Tarîx-e Keşaf* de eslê donbolîyan sey *kurmanc* nîşan dano. Nusxayê nê kitabî serra 1849î nawna.¹¹⁵

Şerefxan, Dunbilyan ra sey “eşîrê Dinbilîyan” bi îfadeyê zafhûmarî behs keno. Tayê çimeyan de dunbilîyan ra sey “ebr” yanî sey “eşîrêka konfederatîfe” behs beno.¹¹⁶ Wina aseno ke dunbilî eşîrêka girde bîya û zaf eşîr û barixan ra ameya pê. Ewro herçiqas nameyê “dimilî” teşmîlê zafê kirdan bîyo zî sey nameyê eşîre zî esta û qismêkê înan kird/zaza û qismêkê înan zî kirdas/kurmanc o. Merdim şêno vajo ke, yan rewna ra mîyanê dunbulîyan de nê her di lehçeyî qisey bîyêne. Yan zî zemanî reyde goreyê cografya lehçeyê înan vurîyayo.

2.4. Zaza

Kirdê ke derûdorê Xarpêt, Pali û Maden de ciwîyenî qismêkê înan xo ra vanî “zaza”. Reyna, hetê Qoçgîrî û Aksaray de zî tayê kirdî xo sey “zaza” name kenî. Nê, ziwane xo ra “zazakî” vanî. Cîrananê xo kurmancan ra *kurmanc/kurmonc* yan zî *kirdas/kirdasî* vanî. Ma naye vajî ke ewro no name teşmîlê zafê kirdan bîyo û goreyê serranê verênan mintiqaya Kirdane de nika vêşî vila bîyo.

2.4.1. Derheqê Kokê Çekuya “Zaza” de

Derheqê kokê çekuya “zaza” de nuştox û cigêrayoxan mîyan de yew pêameyîşêk çin bo zî wina aseno ke rêça na çekuye hetanî dewrê verê Îsayî şina.

Îsayî ra ver nîzdê serra 3000–2500 de bajarê Sumerîyan Marî de nameyê yew mabedî *Nînnî-Zaza* bi. Nê mabedî ra tayê çiyê ke mendî Sûrîye/Şam de Muzeya Milî de yî.¹¹⁷ Marî, nika sînorê Sûrîye de, rojawanê Firatî de bi nameyê Tell Herîr yew bajarêko antîk o. Eslê xo de *Nînnî-Zaza* yan *Înnana-Zaza* yew

¹¹⁴ Wisif Zozanî, “Asmênê Kirdan ra Estareyêko Nimite: Mehemed Elî Ewnî”, Nûbihar, Hûmare: 118, İstanbul 2012, r. 10

¹¹⁵ M. Reza Hamzeh'ee, Yaresan (Ehl-i Hak) Bir Kürt Cemaati Üzerine Sosyolojik Tarihsel ve Dini-Tarihsel Bir İnceleme, İngilizceden Çeviren: Engin Öpengin, Avesta, İstanbul 2009, r. 62

¹¹⁶ İbrahim Bozkurt, “Dümbülliler veya Bermekiler”, Aşiretler Tarihi, İstanbul 2009 na neql: <http://www.asiretler.com/Yazilar.asp?goster=dos&id=169>

¹¹⁷ Temple of Ninni-zaza, http://www.homsonline.com/EN/Citeis/slides/Mari_WorshipperStatuette.htm

- Antiquities Oriental: Mari Model, <http://www.lessing-photo.com/dispimg.asp?i=080208+4+&cr=20&cl=1>

¹¹⁸ Malmîsanij, Kird, Kirmanc, Dîmilî veya Zaza Kürtleri, Deng Yayınları, İstanbul 1996, r. 22

homaya Sumerîyan a.¹¹⁸

Zaza, Tewrat de zî sey nameyê şexsî vîyareno. Goreyê tewratî *Zaza* neslê Yehûdayî ra lajê Yonatanî yo.¹¹⁹

Goreyo ke Xalis Ataksoy neql keno, Kirxî verê Îsayî 880 de seba Asur-Nazirpalî şonî *Zaza-Buha*. No ca beno ke hetê koyê Mîhrabî yan zî koyê Çîmenî de bo. No ca nîzdîyê welatê Kirxî/Korxî yo.¹²⁰ Koyê Mîhrabî hetê Madenî de yo ke uca de nika zazayî ciwîyenî.

Wextê qralê Persan Darîusê yewinî (522-486 ÎV) de bi nameyê *Zazana* cayêk ra behs beno. No name kitabeyê Bîstunî¹²¹ de estûna yewin, paragrafo 19. û rêza 92. de vîyareno. Qral Darîus behs keno ke *Zazana* serê rayîrê Babîlî de, kinarê Firatî de şaristanêk o.¹²²

Dewrê Îslamîyetî de zî no hewa nameyê cografîkî sey “زازور” *Zozan, Zûzan, Zewazan, Zûzan el-Ekrad* (Zûzanê Kurdan) tayê nameyî çimeyan de vîyarenî. Yaqût El-Hemawî (1179-1229), na çekuye sey “Zewazan” nuseno û vano ke “na mintiqa mîyanê koyanê Armenîye, Azerbaycan, Dîyarbekir û Musulî de marena. Şarê ci armenî û kurd î.” Dima Balazûrî (wefat: 893) ra neql keno ke “Îyad b. Ganem fethê Cizîre ra dima serra 19. ya hîcrî de bi rayîrê *Zewezan* şino Qarda û Bazabda.” El-Hemawî, dima İbnul-Esîrî ra tayê malumatan neql keno. Qaso ke İbnul-Esîrî (1160-1234) vano, “*Zûzan* yew mintiqa ya ke rojhelatê Dicle ra resena hetanî Cizîre. Reyna mesafeyê di rojan Musul ra cor dest pêkena resena hetanî sînorê Axlat û hetanî sînorê Salmasî şina û Azerbaycan de qedîyena. Na mintiqa de qelayê kurdanê Boxt û Beşnewîyan estî û nê qelayî zaf saxlem û rindek î.”¹²³ İbnul-Esîrî eynî wext nê cayî ra bi nameyê *Zûzan el-Ekrad* (Zûzanê Kurdan) behs keno.¹²⁴

Nefîsî behs keno ke “Zazeyn” yeno manaya “di Zaz”î; û di dewê ke pêrabesteyî semedê İnan vajîyeno.¹²⁵ Kitabê Hamzeh’ee de zî behs beno ke, Zazeyn di mintiqayanê pêrabesteyan ra ameyo meydan û hergû yewe sey “Zaz”

¹¹⁹ Old Testament (Tanakh), Chronicles-I, 2:33, r.234

¹²⁰ Halis Ataksoy, Diyarbakır Tarihinde Komuk Eli, Haz. Yılmaz Ataksor, Çeltüt Matbaacılık, İstanbul 1988, r. 30

¹²¹ Bîstun, yew bajarê eyaletê Kırmanşanî yo ke şarê ci kurd o.

¹²² The Behistun inscription, Column 1, lines 91-96, <http://www.livius.org/be-bm/behistun/behistun-t11.html>

¹²³ Yakut El-Hamawî, Mucemu’l-Buldan, C. 3, Daru’s-Sadr, Beyrut 1977, r. 415

¹²⁴ Borîs James, Selahaddin ve Kürtler, Çev: Nazlı Bilgiç, Avesta Yay., İstanbul 2011,

¹²⁵ Said Nefisi, Babek, Azerî Türkçesine çeviren E. Azerî, Türkiye Türkçesine aktaran Mahmut Ayaz, Berfin Yayınları, İstanbul, Haziran 1998, r. 37 ra neql: Roşan Lezgin, “Khorrek Sözcüğünün Kökeni Hakkında”,

<http://www.zazaki.net/haber/khorrek-sozcugunun-kokeni-hakkinda-440.htm>

¹²⁶ M. Reza Hamzeh’ee, Yaresan (Ehl-i Hak) Bir Kürt Cemaati Üzerine Sosyolojik Tarihsel ve Dini-Tarihsel Bir İnceleme, İngilizceden Çeviren: Engin Öpengin, Avesta, İstanbul 2009, r. 98, 76 nolu dipnot

tabîr bena. No ca bi ihtîmalêko pîl koyê Loristanî de yo.¹²⁶

Nê çimeyanê tarîxîyan ra fam beno ke çekuya “zaza” verê cû sey nameyêkê cografîkî ameya şuxulnayîş. Bi rastî nê nameyan û zazayanê nikayînan mîyan de têkilîyêka rasteraste îspat nêbîya, la tayê cayan de “zaza” sey nameyê cayî yeno şuxulnayîş. Goreyo ke Malmîsanij neql keno, Erzingan û Erzirom-Çad de dewa *Zazalar*, Mîdyat de *Zaza*, Kurdistanê Başûrî de *Zazan*, Kurdistanê rojhelatî de mintiqaya Hewramîyan de *Zaza Ra* (Rayîrê Zaza) û *Qulê Zazî* yeno şuxulnayîş.¹²⁷ Sêwas-Zara de zî bi nameyê “Zazalar” yew dewe esta. Tarîxçeyê na dewe de vajîyeno ke dewe ra *Dimilie Nahalee* (*Dimilîyê Nahalê?*) zî vajîyeno. Nameyê dewijan mîyan de *Elî Dimilî* û *Kalê Dimilî* zî vajîyeno ke têkilîya *Dimilî* û *Zaza* nawnenî.¹²⁸

Tayê çimeyanê kirdaskî de zî *zaza* sey *zazan* nusîyayo. Mavajî Ferhengê Musa Anterî de “*zazan*: yew eşîra kurdan” nusîyayo.¹²⁹ Ferhengê Qanatê Kurdoyi de zî *zaza* û *zazan* eynî mana de ameyî gurênayîş ke ferheng de “*zaza*: biewnî *zazan*” nusîyayo.¹³⁰ Cegerxwîn zî yew şîîra xo de wexto ke grûbanê kurdan hûmareno çekuya *Zazan* şuxulneno: “Lazim e em hewl bidin bo ittîfaqî Kurdê me / Buxtî û Zazanî min hem Sorî û Babanî tu.”¹³¹ Nê zî têkilîya *zaza zazan/zozan/zewazan* anî vîrê ma.

Ma naye vajî ke sewbîna şaran mîyan de zî sey nameyê cayî, yan sey nameyê qebîleyî, yan zî sey nameyê şexsî çekuya “zaza” ameya şuxulnayîş. Mesela pabesteyê Trabzon-Arsînî bi nameyê *Zazana* yew dewe esta ke nameyê na dewe nika bedelîyayo bîyo “Güneyce”.¹³² Labelê têkilîya nê nameyan û zazayan tespît nêbîya. La wina aseno ke prosesê tarîxî de sey nameyêko cografîk ameyo şuxulnayîş. Beno ke nameyêko topografîk bîyo, coka hende cîya cîya cayan de esto.¹³³

Goreyê tayê aliman kokê çekuya “zaza” bi herfa *z* ra eleqedar a. MacKenzie û Celadet Bedirxan nê ihtîmalî ra behs kenî. Goreyê nê fikrî, zîwanê kirdan de seba ke herfa *z* zaf vîyarena coka wina vajîyayo. C. J. Rich, zî çekuya “zaza” sey “merdimoy peltek, kekeme, merdimoy ke qala ey fam nêbena” îzeh keno. Wina aseno ke Rich, çekuyê fransîzkî *zézayer* û *zozoter* ra wina yew

¹²⁷ Malmîsanij, Kird, Kırmanc, Dimilî veya Zaza Kürtleri, Deng Yayınları, İstanbul 1996, r. 25

¹²⁸ Zazalarkoyu.com, “Tarihçemiz”, <http://www.zazalarkoyu.com/tr/tarihcemiz>

¹²⁹ Musa Anter, Ferhenga Khurdî-Tirkî, Yeni Matbaa, İstanbul 1967, r. 158

¹³⁰ Q. Kurdo, Ferhenga Kurdî-Rusî, Neşîrxana Dewletê ya Ferhengêd Zimanê Miletêd De-reve û yê Sovêtîstanê, Moskowa 1960, r. 800

¹³¹ Cegerxwînê Kurdî, “Berdêlk”, Hawar: Kovara Kurdî, hûmare: 10, 23 Octobre 1932, r. 3

¹³² Tapu Kadastro Erzurum 8.Bölge Müdürlüğü, <http://www.e-tkbm.gov.tr/publisher/tkduru-milce.asp?ilceid=856>

¹³³ Gurecuyan û firansizan mîyan de sey nameyê şexsî “Zaza” esto. Peştûnan (efxanan) mîyan de zî nameyê yew eşîre “Zazî” yo: <http://www.zazai.de/zazien.html>

¹³⁴ Malmîsanij, Kird, Kırmanc, Dimilî veya Zaza Kürtleri, Deng Yayınları, İstanbul 1996, r. 22

texmîn kerdo.¹³⁴

Goreyê tayênan zî, kokê çekuya “zaza” vengê **za** ra yeno. **Za** zayıf ra eleqedar o û tayê cayan de manaya *laî* dano. Kurmancîya cêrêne de **za** yeno manaya *gedeyî* û *zaza* zî yeno manaya *torinî*. Kirdkîya Motkan û Hewêlî (Baykan) de, **za**, **ze**, **zak** manaya *laî* de yeno gurênayîş. Reyna îdyomê sey “za û zêç” yan “zar û zêç” de **za** û **zar** manaya *gedeyî* de şuxulnîyayê. Reyna tayê îfadeyê heqaretî sey “kutik zayê kutikî” de zî **za** manaya *laî* de ya. Reyna çekuyanê sey *xalza*, *birarza*, *dayza/datiza*, *wariza* de zî ma na rewşe vînenî. Reyna kirdaskî de *zar*, *zak*, *zarok* zî manaya *gede* û *laî* danî.¹³⁵ Reyna kirdkî de îfadeyê “zay zayonê ma yo” de zî **za** manaya *neseb* û *nesilî* dano, eqrebatîya dûrî û nesla abiryaya îfade keno. Ferhengê Îzolî de zî **zaz** yeno manaya *torinî*.¹³⁶

Nê teorîyan ra teber çîyo eşkera no yo: “Zaza” wextê Osmanîyan de yew nameyê eşîra kurdan bîyo û dima manaya xoya ewroyîne ra nîzdî semedê zafê kirdan ameyo şuxulnayîş.

2.4.2. Çimeyanê Nuşteki û Fekkîyan de “Zaza”

Tarîxo nîzdî de “zaza” hîna zaf sey nameyê eşîrêka kurdan vîyareno. Şecereyê Qureşan ke hetê Seyîd Kekîlî ra weşanîyayo bi texmînî seserra 13. ra menda, nê şecereyî de talîbî (murîdî) û nameyê eşîra înan qeyd bîyo. Nameyê new hebî eşîranê kurdan no şecere de rêz bîyî û înan ra yew zî eşîra “Zaza” ya. Şecere de bi erebkî “Talîb Molla Nebî mîn qabilet **Zaza**” yanî “Eşîra **Zaza** ra talîb Molla Nebî” nusîyayo.¹³⁷

Yew şîira ke nîsbetê şaîr Kaygusuz Abdalî (1341-1444) bena, uca de zî nameyê “zaza” vîyareno: “Eğer bu sene çıkar isem yaza / Toplayım bir parça Gürcü, Abaza / Elime geçerse on kadar Zaza / Yolar sakalını kavlak satarım”¹³⁸

Ewlîya Çelebî (1611-1682), *Seyehatname* de mîyanê eşîranê kurdan de behsê eşîra *Zaza* zî keno: “... eşîra Haltî û eşîreta Çekvanî û eşîra Yezîdî eşîra *Zaza* û Zebarî û Lolo û eşîra Îzolî û Şîkakî û Kîkî ke vejîyenî wareyê Çewlîgî heme di henzar kurdî kenî. Des henzar heywanê înan estî û goreyê naye mer-

¹³⁵ Malmîsanij, Kird, Kırmanc, Dimlî veya Zaza Kürtleri, Deng Yayınları, İstanbul 1996, r. 21

¹³⁶ D. Izoli, Ferheng: Kurdi-Tırki, Türkçe-Kürtçe, Deng Yayınları, İstanbul, 1992, r. 462

¹³⁷ Kureşanlı Seyyid Kekil, Peygamberler İle Seyyidlerin Şecereleri ve Aşiretlerin Tarihi, Hans und Sigrîd Verlag, Köln, r. 215 ra neql: Munzur Çem, <http://www.zazaki.net/file/kur%C3%AAsan-asireti-ve-gandi-kemalin-turkmenlesmesi.pdf>

¹³⁸ Cahit Öztelli, Bektaşî Gülleri, İstanbul, 1985, r. 334 ra neql: Malmîsanij, ecv, r. 22 (Tayê varyantan de no qîşim çin o.)

¹³⁹ Evliya Çelebi, Seyehatname, Topkapı Sarayı Kütüphanesi Bağdat Kitaplığı, 305 n.yazma, 3. Kitap, vrk. 85-b ra neql: Ercan Çağlayan, “Osmanlı Belgelerinde Zazalar ve Zazaca Üzerine Notlar”, 1.Uluslararası Zaza Dili Sempozyumu (13-14 Mayıs 2011), Bingöl Üniversitesi Yayınları, Ankara 2011, r. 273-274

dimê begê Çabaxçurî înan ra uşir gênî.”¹³⁹ Çelebî, wexto ke behsê ahalîyê Çewlîgî keno çend cayan de zazayan ra sey “Ekrad-ı Zaza” (Kurdê Zazayî) behs keno.¹⁴⁰ Çelebî yewna ca de vano ke “Duwês hebî zıwanê kurdan estê” û mîyanê înan de “zazakî” zî hûmareno. Reyna, zaf cayan de tabîrê “lîsan-î Zaza-î Ekrad” şuxulneno.

Tayê wesîqeyanê arşîvê Osmanîyan de zî behsê eşîra Zaza beno. 1845 de defterê temettu yê Dîvrîgi-Yagıbasan de binê nameyê eşîra Zaza de 51 reîsê xaneyî qeyd bîyî. Reyna 1886 de nuştayo ke Mamuretu-l Ezîzî rê şawî-yayo uca de behsa eşîranê Zaza û Balican beno, cayê nê eşîran Dîvrîgî û Qoc-gîrî aseno.

Salnameyê Wilayetê Osmanîyan de (1867 ra dima) ca bi ca behsê zazayan bîyo. Hetê nufusî ra zazayî mîyanê kurdan de hesebîyayê. Hetê zıwanî ra zî zafane “Kurdî” mîyan de hesebîyay, la wexto ke bitaybetî behs beno, zafane “lîsan-î Zaza-î Ekrad”, ge-ge zî sey “Kürdçeden muharref Zazaca”, “Farsçadan Muharref Zazaca”, “Zaza lisanı” tabîrê cîya-cîya estî. No het ra Mewlidê Ehmedê Xasî nimûneyêko balkêş o. Seke ma cor de behs kerd, Ehmedê Xasî seba mewlidê xo “Mewlidê Kirdî” vano. Labelê destpêkê mewlidî de nuştayê îznê resmî de bi Tirkî “Zaza lisanı” vajîyeno. Nuştayo ke semedê musadeyê çapkerdişê mewlidî hetê wilayetê Dîyarbekirî ra Nezaretê Maarîfî rê şawîyayo, uca de tabîrê “Zaza lisanı” vîyareno, la cewabo ke Îstanbûl ra, yanî Nezaretê Maarîfî ra yeno, uca de “Zaza lisanı üzere muharref Kürdçe Mevlîd-î Şerîf” nuseno.¹⁴¹ Reyna, wextê Osmanîyan de behsê yew Încîlî beno ke bi Zazakî nusîyayo. No Încîl 1900 de London de çap bîyo û 1902 de erşawîyayo İran, la seba ke hukmatê Osmanî ra musade nêgêrîyayo Bexdad de tepişîyayo, nê nuştayan de zî nê Încîlî ra sey “lisan-ı Zaza Kurdî” behs beno.¹⁴²

Mustafa Kemal 21.08.1919 de yew telegrafê xo de wexto ke behsê Sêvas û Erzınganî keno, tabîratê “Zaza denilen Kürtler” şuxulneno.¹⁴³ Dr. Nurî Dêrsimî zî, *Zazayan mîyanê eşîranê Qocgiri de hûmareno*.¹⁴⁴

Ziwanzan Le Coqî tayê metnê kurmançî û kirdkî arê dayî. Metnê kirdkî fekê Omar İbn Elî Kosa (Umer lajê Elî Kosayî) ra arîdîyayî. Umerê Elî Kosa ke bi nameyê “Xalo” yeno şinasnayîş, xo sey “Xalo eşîret Zaza” îfade keno. Xalo xo bi kurmanckî dano şinasnayîş ke “welatê ey Çermûg o, la dima semedê karî

¹⁴⁰ Evliya Çelebi, *ecv*, 3. Kitap, vrk. 88-b ra neql: Ercan Çağlayan, *ecv*, r. 274

¹⁴¹ Neqlkerdax: Wisif Zozanî, *Derheqê Tarîx û Zûnî Kirdûn di Panel, Çewlîg*, 02.04.2011 (vîdeo)

¹⁴² Ercan Çağlayan, “Osmanlı Belgelerinde Zazalar ve Zazaca Üzerine Notlar”, 1.Uluslararası Zaza Dili Sempozyumu (13-14 Mayıs 2011), Bingöl üniversitesi Yayınları, Ankara 2011, r. 281

¹⁴³ Mustafa Kemal, *Nutuk*, Cilt: I (1919-1920), Devlet Matbaası, İstanbul, 1934, s. 71-72

¹⁴⁴ M. Nurî Dersimî, *Kürdistan Tarihinde Dersim*, Ani Matbaası, Halep 1952, r. 61

ameyo Şam û nika Şam de mehleya Salihîye de ronîşeno, emrê ci hewtay û heştî yo.” Û dima tayê metnanê *zazakî* neqlê nuştoxî keno. Yew metn bixozazakî yo, ê bînî kurmanckî û tirkî ra tadîyayî zazakî ser.¹⁴⁵

Kitabê *Tarîxê Kurd û Kurdîstanî* de M. Emîn Zekî Beg, “Zaza”yan mîyanê eşîranê kurdan de hûmareno. Goreyê naye eşîra *Zaza* rojhelatê Xarpêtî de ciwîyena û henzar xane ra yena pê.¹⁴⁶ Yewna ca de zî behs keno ke hetê Sêwregi de zî eşîra *Zaza* esta, labelê na tena yew eşîre nîya.¹⁴⁷

Kurdê ke Urdun de ciwîyenî mîyanê înan de zî eşîra *Zaza* esta. Înan ra Xatem Zaza el-Kurdî nê malumatî dayî ma: “Zaza Urdun de yew aîleya/eşîra kurdan a. Sewbîna bi nameyê ‘Şêxo, Barava, Axa...’ barixê kurdan estê. Wextê Osmanîyan de hetê Dîyarbekirî ra ameyê Urdun.”¹⁴⁸ Kitabê *Kurdê Urdunî* de zî “zaza” ra sey eşîrêka kurdan behs beno. Goreyo ke kitab de behs beno, kurdê Urdunî nê eşîran ra ameyî meydan: Eyûbî, Aşîfî, Baravî, Berazî, Daqurî, Dêrikî, Reşwanî, Şêxanî, Metînî, Millî, **Zaza**, Kîkî, Wanî û Omerî. Binê eşîra *Zaza* de zî nê barix û keyeyî hûmarîyenî: Ziriklî, Zikrî, Molla, Urfalî, Siwêreklî, Îbişî, Dîyarbekirî, Qereşolî û Alûsî.¹⁴⁹ No kitab hetê Muhammed Elî es-Siwêrekî el-Kurdî ra nusîyayo. Seke kunyeya nuştoxî ra aseno, o bi xo zî kurdanê zazayan ra yo. Malumatê nuştoxî û malumatê ke Ewliya Çelebî û M. Emîn Zekî Beg dano pê gênî. Heto bîn ra *Seyehatnameyê* Ewliya Çelebî de zî kitabê Elî Siwêrekî de zî nameyê “Zaza” û “Kîkî” pîya vajîyenî. Beno ke nê her di eşîran pîya koç kerdo şîyê Urdun.

Goreyê nê malumatan ma şênî vajî ke prosesê tarîxî mîyan de *zaza* sey nameyê eşîrêka kurdan ameyo şuxulnayîş û dima teşmîlê kirdanê bînan zî bîyo. Xora, kirdê ke semedê xo nê nameyan şuxulnenî hetê etnîkî û milî ra xo kurd vînenî.¹⁵⁰ La wexto ke bitaybetî/bixusûsî xo ra behs bikî, nê nameyan şuxulnenî.

3. NAMEYÊ BÎNÎ

3.1. Şarê Ma

¹⁴⁵ Albert Von Le Coq, *Kurdische Texte*, Cîld: 2, Reichsdruckerei, Berlin 1903, r. 63

¹⁴⁶ M. Emîn Zekî Beg, *Kürtler ve Kürdistan Tarihi*, Terc. V. İnce, M. Dağ, R. Adak, Ş. Aslan, Nûbihar, İstanbul 2011, r. 358

¹⁴⁷ M. Emîn Zekî Beg, *Kürtler ve Kürdistan Tarihi*, Terc. V. İnce, M. Dağ, R. Adak, Ş. Aslan, Nûbihar, İstanbul 2011, r. 363

¹⁴⁸ Bîlal Zilan, “Urdun de Kurdê Zazayî”, *Newepel: Rojnameyo kulturî yo pancêsoje*, Hûmare: 22 (01-15 Sibate 2012), r. 6

¹⁴⁹ Muhammed Alî es-Siwêrekî el-Kurdî, *Ürdün Kürtleri*, terc. Qedrî Yildirim, Avesta, İstanbul, 2006, r. 94

¹⁵⁰ Serdar Yildirim, “The Use of the Name ‘Zaza’ and the Understanding of ‘Kurdishness’ among Zaza Villages of Lice and Hani”, *International Conference The Zaza People: History, Language, Culture, Identity*, Yerevan, Armenia, 28 October 2011

Kirdan ra qismêk ke hetê Gimgim (Varto) û Xinisî de ciwîyenî semedê xo nameyêko taybetî/xusûsî ra vêşêr, hîna zaf tabîrê *şarê ma* şuxulnenî. Semedê zıwanê xo zî *zonê ma* (ziwanê ma) yan *so-be* (şo-bê) vanî. Eslê xo de nê nameyê taybetî û etnikî ney, nameyê tebîî yî. Çimkî ma zanî, ê ke nameyanê bînan şuxulnenî zî qıseykerdişê xo de semedê xo “şarê ma” yan zî “zonê ma” vanî. Reyna tabîrê *so-be* zî fîilanê *şîyayîş* û *ameyîş* ra virazîyayo ke halê emirî de nê fîilî sey “şo”, “bê” vajîyenî. Nê, bi eynî mantiq *kirdaskî* ra zî *here-were* vanî. Nê tewir namekerdişê tebîî mîyanê heme miletan de estî.

3.2. Ginî, Çarek, Lol

Ginî (eşîra Ginîyan), Çarek (eşîra Çarekan) û Lol (eşîra Lolan) nameyê eşîrê kurdan ê. Ginîyî, hetê Zara-Bekpar (Beypınar) û koyê Qerabelî (Sîwas) de ciwîyenî.¹⁵¹ Çarekî zafane hetê Zara, Dîvrîgî, Erzingan û Erziromî de estî. Eşîra Lolan zî Dêrsim, Erzingan, Xinis û Gimgim de ciwîyena.¹⁵² Cayê ke nê eşîrî tede ciwîyenî, uca de kurancî înan ra hîna zaf bi nameyê nê eşîran xıtab kenî; înan sey Ginî, Çarekî, Lolî name kenî. Mesela Xinis (Erzirom) de semedê elewîyan “Çarek” vanî, la seke ma va, nê heme nameye eşîran î; ê cayan de bi hewayêk teşmîl bîyî.

3.3. Kur

Tayê cayanê Dêrsimî de semedê kurdanê sunîyan *kur* vajîyeno. Mesela, yew kilama Sey Qajî de seba ke kirdasê Qereyazî¹⁵³ sunî yî, înan ra sey “kur” behs beno:

“(…) Cêr saade ma hardo dewres o / Mîrê mi, cor asmêno kew o / Carû **Kirmancîye** de kês nêkoto / (Mîrê mi) binê dest û pawû (...) Mîrê zalimî do kistene / Xelîl Begê minê Yelaldî ye / Eve destê **Kurrûnê** Qereyajîye. / Mîre to wonceno soxir / kenê duskunê Cem û Cematê **Kirmancîye**”¹⁵⁴

Goreyê ke Malmîsanij neql keno no name tena hetê kirdan ra semedê kurmancan nêvajîyeno. Tayê cayanê Dêrsim û Meraşî de elewîyê kurancî zî semedê kurmancanê sunîyan şuxulnenî.¹⁵⁵

Tayê cayan de semedê zazayanê sunîyan zî *kur* vajîyeno. Mavajî cayê ke elewîyê dêrsimijî û zazayê sunî cîran bî, elewî ge-ge înan zî sey “kur” name kenî.¹⁵⁶ Na rewşe kitabê Heyder Işikî de zî vîyarena. Uca de Memik Axawo

¹⁵¹ M. Nurî Dersimî, Kürdistan Tarihinde Dersim, Ani Matbaası, Halep 1952, r. 62

¹⁵² M. Nurî Dersimî, Kürdistan Tarihinde Dersim, Ani Matbaası, Halep 1952, r. 53, 55, 69

¹⁵³ Qereyazî yan zî Gogsî (bi tirkî: Karayazı) nika qezaya Erziromî ya.

¹⁵⁴ Daimi Cengiz, Dizeleriyle Tarihe Tanık Dersim Şairi Sey Qajî, Horasan yayınları, İstanbul 2010, r.438

¹⁵⁵ Malmîsanij, Kırd, Kırmanc, Dimilî veya Zaza Kürtleri, Deng Yayınları, İstanbul 1996, r. 10

¹⁵⁶ Ma nê malumatî yew elewîyê koçgîrijî ra girewtî.

Dêrsimij wina vano:

“Saadettîn Efendî, Bertal Axa serekê ‘eşîrda Xormek o. Ti zî rind pê zanê. Ena ‘eşîri heywanî inkay mêldê dewleti di vejîyay. Serehewanayîşê Şêx Saîdî di derbi daya **kuruyano**.”¹⁵⁷

Qaso ke nê malumatan ra fam beno *kur* ra qest ha kird ha kirdas sunî yî. Seke tirkî de semedê kurdan manaya heqaretî de “kuro/kuro” vajîyeno, wina aseno ke *kur* zî hetê elewîyanê kurdan ra semedê sunîyanê kurdan manaya şenik dîyayîşî de yeno şuxulnayîş. La hetê etîmolojî ra *kur*, çekuya *kurd* yan *kurmanc* de eleqedar asena ke merdim eşkeno vajo ke kilmbîyayîşê nê çekuyan o. Labelê ê ke sunîyê kurdan sey kur name kenî, zîwanê înan ra sey “kurkî” çîyêk nêvanî. Ma ewta ra zî zanî ke no eslê xo de namekerdişêko etnikî nîyo.

Mîyanê êzidîyan de zî wina yew halê sosyo-reaksiyonî esto. Êzidîyan ra qismêk seba ke zafanayê kurdan musulman î, coka nêwazenî ke xo sey kurd name bikî. Çimkî goreyê înan kurd manaya musulmanî de yo. Coka yan xo tena sey êzidî, yan zî sey kurmanc name kenî.¹⁵⁸ Ma nê nimûneyan ra fam kenî ke cîyabîyayîşê bawerî ca bi ca tesîrê xo nasnameyê miletî ser o zî keno. Çekuya *kur* zî bingeyê xo wina yew cîyabîyayîşê bawerî ra girewto.

3.4. Kirdas/Kirdasî

Mîyanê kurdan de semedê kurmancan *kirdas/kirdaş/kirdasî* vajîyeno. Ê ke xo *kirmanc* û *dimilî* name kenî hema-hema temamê înan semedê kurmancan *kirdas/kirdaş*¹⁵⁹ vanî, Ê ke xo *kird* û *zaza* name kenî, înan ra zî qismêko muhîm kurmancan ra *kirdas/kirdasî* vanî. Nê eynî wext lehçeya kurmançî ra zî *kirdasî/kirdaşî* yan *kirdaskî/kirdaşkî* vanî. Mesela na kilama Sey Welî de kurmançkî ra sey *kirdaşî* behs beno: “Na Bamasurê ma ke ortê Sadiz û Hîzolî ra şî / Kilama Haqîye vurnê, çarnê lo loê **kirdaşî**”¹⁶⁰

Seke ma cor de zî behs kerdbi goreyê Kemal Badilî, kurdê zazayî seba ke xo kurdê esil vînenî coka xo sey *kird*, kurmançan zî sey *kirdasî* name kenî. Badilî, çekuya *kirdasî* bi tirkî “Kürdümsü, Kürtçük” (sey kurdî, seke kurd, kurdo wîtelek/hurdek) mana keno. Seke aseno *kirdas/kirdasî* çekuya *kird* û suffiksê -*as/-asî* ra ameya meydan (*kird-asî*). Kirdaskî de suffiksê -*asî* esto ke manaya *şenik*, *qij*, *tay*, *kemî* dano. Goreyê tayê ziwannasan eslê nê suffiksî çekuyêka

¹⁵⁷ Haydar Işık, Memik Axa wo Dêrsimij, Tirkî ra tadayox: Mihem Himbêlij, Apec, Stockholm, 1994, r.78

¹⁵⁸ Bîlal Zîlan, “Derheqê Konferansê Erîwanî de”, Newepel: Rojnameyo kulturî, Hûmare: 17, 16-30 teşrîne 2011, r. 4

¹⁵⁹ Fekê Dêrsimî de “s-ş” bedelîyeno.

¹⁶⁰ Daimi Cengiz, Dizeleriyle Tarihe Tanık Dersim Şairi Sey Qajî, Horasan yayınları, İstanbul 2010, r.173

kirdaskî *kasî* (şenik, qij, kemî) ra yeno û sey çekuyanê *tengasî, kurtasî, kêmasî* manaya negatîfe de yeno şuxulnayîş.¹⁶¹ Reyna hem kurdî hem zî fariskî de îlaweyê *-asa* esto ke terkîban û çekuyanê pêrabesteyan de manaya *sey, seke* dano.¹⁶² Kirdî de zî çekuya *winasî* de ma rêça nê sufiksî vînenî.

Herçiqas zafê cayan de semedê kurmancan *kirdas/kirdasî* vajîyo zî qezaya Licê de sey îstîsnayêk semedê kirdan/zazayan zî yeno şuxulnayîş. Licê de neke kurmancan ra, ê ke dima daxilê mîyanê eşîrê kirdan bîyî, înan ra kirdasî vanî. Yanî Licê de *kirdasî* ê ke eslê xo ra *kird/kurd* nîyî, semedê înan vajîyeno. Na babete de Roşan Lezgîn, Hemê Mede (muxtarê *Bawerde*) ra tayê malumatane balkêşan neql keno: “*Gavnor, Qencer, Qerac*, qismêkê her di *Xodîgan* û *Sêqas* kirdê koçer ê, *zîktheyîj* ê. Merkezê nê koçeranê *zîkthey, Gavnor* o. Merkezê *zîktheyijan* zî *Zîktê* yo. Meselaya **kirdasî**bîyayîşî zî na ya ke, bi eslê xo tam kird yan zî mavajin kurd nêbîyayîş o. Nika hende kewtê têmîyan, êdî heme bîyê kird. Ê dewê cêrinî ke ma xo mîyan de înan ra vanê “**kirdasî**” la seba ke merdimê ma yê û ma reyde zaf wext koçerîye de bîyê loma kirdê bînî, ma hemîne ra vanê “**kirdasî**”. Feqet esas, ma heme **kirdasî** nîyê. *Zîktheyîjî* kirdê esîl ê. *Kirdasî* dima amey resayê bi koçeranê ma. Ê zî di babî yê: Memanî û Ele Rûtî. Mem zî Elo Rût zî, bi eslê xo metrebî yê. Mem sêwî bîyo, dewa *Cimarre* de resayo bi koçer ma. Babîyê ey ameyo kiştîş, babîyanê ma ra yewî dadîya ey marre kerda. Babîyê ma Mem kerdo weye û dima eşîra ma ra yew kêna daya ey. Ma reyde koçerîye kerda. Elo Rût zî, merdimê Memî yo, dima ameyo resayo ma, o zî bi no qayde, bîyo kirdasî. Nika kirdan û kurmancan reyde zî kêney dayê yewbînan, bîyê kird la seba ke babî ra kirdê xasî nîyê, loma ma înan ra vanê, ‘kirdasî’. Yanî, ê ke bi eslê xo tam kird nîyê, dima bîyê kird yan zî gwunî kewta têmîyan, ma înan ra vanê, ‘kirdasî’. Ma kurmancan ra nêvanî kirdasî. Ê zî sey ma kurd ê. La zîwanê înan bineyke ferq esto. Mesela ma vanê “**kird**”, ê vanê “**kurd**”. Her di kelîmeyî yew ê. Kokê ma yew o.”¹⁶³

4. NETÎCE

Prosesê tarîxî mîyan de kirdan semedê xo nameyê cîya-cîyayî şuxulnayî. *Kird, kirmanc, dimilî, zaza* heme nameyê yew grûbe yî. Nê heme nameyî tarîx de semedê kurdan ameyî şuxulnayîş û raste-rast tarîxê kurdan ra eleqedar î.

Nê nameyan ra *kird* û *kirmanc* nameyê etnîkî û milî yî. Kirdan bi xo nê nameyî şuxulanayî û no hem bi çimeyanê nuşteki hem bi çimeyanê fekkî tespît

¹⁶² Cemşîd Salehpûr, Farsça-Türkçe Genel Sözlüğü, Jangal Yayınevi, 1964 (?), r. 76

- Zana Farqînî, Ferhengê Kurdî-Tirkî, Ensîtuya Kurdî ya Stenbolê, Çapa dîyine, Zend Yayınları, İstanbul 2005, r. 55

¹⁶³ Roşan Lezgîn, “Nameyê Dew û Mezrayanê Licê”, <http://www.zazaki.net/haber/namey-dew-mezrayan-lic-80.htm>

bîyo. Seba ke nê nameyî telafuzê çekuyanê *kurd* û *kurmanc* î û kurdê bînî zî semedê xo nê nameyan şuxulnenî, çimeyanê teberî de hîna zaf sey umumî *kurd* vîyarto. Coka, merdim bi asanî nêeşkeno çimeyan de rêça kurdanê zazayan û kurdanê bînan nê hetî ra cîya biko. Nê nameyî, hetê kirdan ra tewr verî semedê xo, dima zî bi hewayêko umumî manaya heme kurdan de ameyî gurênayîş. Nê nameyî hetê famê kurdayetî ra nawnenî ke kurdanê zazayan mîyan de nasnameyê kurdayetî rewên û esil o, çîyêko arizî û teberî nîyo.

Dimilî û *zaza* semedo ke hetê kokî ra nameyê eşîrkî/komelkî yî, wexto ke bitaybetî grûbanê kurdan ra behs beno, ca dîyayo nameyê nê eşîran zî. Coka ma tarîxê kurdan mîyan de rêça nê çekuyan bineyna eşkenî kurdanê bînan ra cîya bikî. Nameyê *dimilî* dokumananê tarîxî de goreyê nameyê *zaza* hîna vêşî vîyareno û eslê xo de *dunbul/dumbul* ra yeno. *Zaza* zî prosesê tarîxî de sey eşîrêka kurdan vîyareno û hîna zaf çimeyanê Osmanîyan de ci ra behs beno. Nê nameyê komelkî dima ra teşmîlê kirdanê bînan zî bîyî. Bitaybetî kurmancan semedê kirdan hîna zaf *dimilî*, tirkan zî hîna zaf *zaza* şuxulnayo. Cigêrayoxê rojawanijî zî wexto ke kurdî tesnîf kerdê, hîna zaf nê nameyî şuxulnayî. Çimkî cigêrayoxî, bi nê nameyan grûb û lehçeyê kurdan hîna rehet eşkenî yewbînan ra cîya bikî û tesnîf bikî. Coka, nê nameyan lîteraturê rojawanî de vêşî ca girewto. Kirdê ke nê nameyan semedê xo şuxulnenî hetê etnîkî û milî ra xo kurd vînenî. La wexto ke bitaybetî/bixusûsî xo ra behs bikî, nê nameyan şuxulnenî. Prosesê tarîxî de nê nameyî sey nameyanê alternatîfê kurdayetî yan zî sey miletêkê teberê kurdan de yanî sey miletêkê kurdan ra cîya nêameyî gurênayîş. Eksê ci, nê nameyî hertim semedê yew grûba cematkî ya kurdan ameyî xebitnayîş.

Nameyanê bînan ra *Ginî*, *Çarek*, *Lol* nameyê eşîran î. Nê nameyî tayê minîtiqayanê tengan de manaya komelkî de teber ra semedê înan vajîyenî. Vatişê “şarê ma” zî merdim nêeşkeno nameyêko etnîkî yan komelkî bihesebno, no eslê xo de namekerdişêko tebîî yo. Çekuya *kur* hetê elewîyan ra semedê kurdanê sunîyan manaya qij-vînayîşî de vajîyeno, hetê bawerî ra yew cîyabîyayîşêk îfade keno. *Kirdas* yew îstîsnayî ra teber, semedê kurmancan vajîyeno. Namekerdişê *kirdas* zî mojneno ke kirdan hetê famê kurdayetî ra xo hîna esil dîyo û coka xo ra *kird* kurmancan ra *kirdas* vato.

Nê nameyî, hem mîyanê tarîxî de rêça kirdan bineyna roşn kenî, hem zî hetê nasnameyê etnîkî û milî ra cayê kirdan eşkera kenî. Coka, wexto ke tarîxê kirdan bêro analizkerdiş, gereka nê heme nameyî pîya kirîtk bibî.

ÇIMEYÎ

Albert Von Le Coq, *Kurdische Texte*, Cild 2, Reichsdruckerei, Berlin 1903
Amir Hassanpour, *Kürdistan'da Millyetçilik ve Dil*, Tercüme: İ. Bingöl & C. Gündoğan, Avesta, İstanbul 2005

Beghyani Shadi Sharin, "Bêzhenasiya Zmanê Kurdî Ya Gishtî-40",
<http://www.amidakurd.net/pel/Bejenasi40>

Bîlal Zîlan, "Derheqê Konferansê Erîwanî de", *Newepel: Rojnameyo kulturî*, Hûmare: 17, 16-30 teşrîne 2011

Bîlal Zîlan, "Urdun de Kurdê Zazayî", *Newepel, Rojnameyo kulturî yo pancêsroje*, Hûmare 22, 01-15 Sibate 2012

Borîs James, *Selahaddin ve Kürtler*, Çev: Nazlı Bilgiç, Avesta Yay., İstanbul 2011
Cegerxwînê Kurdî, "Berdêlk", *Hawar: Kovara Kurdî*, hûmare: 10, 23 Octobre 1932
Celadet Bedirxan & Roger Lescot, *Grammaire Kurde (Dialecte Kurmandji)*, Librairie d'Amérique Et d'Orient, Paris, 1970

Cemal Reşid Ahmed, *Ataların Karşılılaşması / Derbend ve Şervan Ülkesinde Kürtler ve Alanlar*, Erebkî ra tercume: Sıraç Direk, Avesta Yayınları, İstanbul 1998, r. 172

Cemîl Rojbeyani, "Fermendarîya Dumbulîyan li der û dora Tebrîzê", <http://asozagrosi.over-blog.com/article-30477740.html>

Cemşid Salehpûr, *Farsça-Türkçe Genel Sözlüğü*, Jangal Yayınevi, 1964

D. İzoli, *Ferheng: Kurdî-Tırki, Türkçe-Kürtçe*, Deng Yayınları, İstanbul, 1992

D. N. MacKenzie, "Kurds, Kurdistan", *The Encyclopedia of Islam - V*, Brill, Netherlands 1986

Daimi Cengiz, *Dizeleriyle Tarihe Tanık Dersim Şairi Sey Qajî*, Horasan Yayınları, İstanbul 2010

DêrsimInfo, "Konferansê Zanistî yê Zonê Kurdî ser o Lerzan Jandilî de roportaj – I", <http://dersiminfo.com/konferanse-zanisti-ye-zone-kurdki-ser-o-lerzan-jandili-de-roportaj/>

Doğan Karasu, *Dinya d' Yo Darê Ma Rencber Ezîz*, Vate Yay., İstanbul 2012, r. 119

Donboli.info, "Emîr Murteza Qulî Xan Dunbulî", <http://www.donboli.info/morteza-goi-khan.htm>

E. B. Soane, *Grammar of the Kurmanjî or Kurdish Language*, London 1913

Ebdullah M. Varlî, *Dîwan û Gobîdeyê Ehemdê Xanî yêd Mayîn*, İstanbul 2004

Ehmedê Xanî, *Mem û Zîn*, Amadekar: M. Emîn Bozarslan, Gün Yayınları, 1968

Ehmedê Xanî, *Memozîn*, Transkrîpsiyon: Arîf Zêrevan, Nefel, Stockholm, 2004

Ehmedê Xasî, *Mewlidê Nebî*, Litoğrafya Matbaası, Dîyarbekir Vilayeti, 1899

Ercan Çağlayan, "Osmanlı Belgelerinde Zazalar ve Zazaca Üzerine Notlar", *1.Uluslar-*

- arası Zaza Dili Sempozyumu (13-14 Mayıs 2011), Bingöl Üniversitesi Yayınları, Bingöl 2011
- Fahri Pamukçu, *Gramerê Zazakî*, Vejîyaîşê Tîjî, İstanbul 2011
- Fırat, "Folklorê Dersîmi ra-II", *Hêvî: Kovara çandîya gîştî*, No: 5, Paris Gulan 1986
- Garnik Asatrian, "Dimlî", *Encyclopedia Iranica*, <http://www.iranicaonline.org/articles/dimli>
- Garnik S. Asatrian & N. Kh. Gevorgian, "Zaza Miscelanny, Notes on some religious customs and institutions.", *Acta Iranica, Volume XII*, Belgium 1998
- Grûba Xebate ya Vateyî, *Ferhengê Kirmanckî (Zazakî)-Tirkî, Wesanxaneyê Vateyî*, İstanbul 2009
- Halis Ataksoy, *Diyarbakır Tarihinde Komuk Eli*, Haz. Yılmaz Ataksor, Çeltüt Matbaacılık, İstanbul 1988
- Haydar Işık, *Memik Axa wo Dêrsimij*, Tirkî ra tadayox: Mihem Himbêlij, Apec, Stockholm, 1994
- Hin Gewêlij, "Deyîra Ehmedê Musayê Axon", *Newepel: Rojnameyo kulturî*, Hûmare: 14, 01-15 oktobre 2011
- Iranica Online, "Donboli", <http://www.iranicaonline.org/articles/donboli-1>
- İbrahim Bozkurt, "Dümbülliler veya Bermekiler", *Aşiretler Tarihi*, İstanbul, 2009
- İhsan Nurî, *Kürtlerin Kökeni*, Tercüme: M. Tayfun, Doz Yay. İkinci Baskı, İstanbul, 1991
- Karl Hadank, *Mundarten der Zâzâ, hauptsächlich aus Siverek und Kor*, Berlin 1932
- Kemal Badıllı, *Türkçe İzahlı Kürtçe Grameri (Kürmançça Lehçesi)*, Ankara 1965
- M. Emîn Zekî Beg, *Kürtler ve Kürdistan Tarihi*, Tercüme: V. İnce, M. Dağ, R. Adak, Ş. Aslan, Nûbihar, İstanbul 2011
- M. Emîn Zekî Beg, *Meşahîr-î Kurd û Kurdistan*, Tercüme: M. Baban, M. Yağmur, S. Kutlay, Stockholm 1998
- M. Nurî Dersimî, *Kürdistan Tarihinde Dersim*, Ani Matbaası, Halep 1952
- M. Reza Hamzeh'ee, *Yaresan (Ehl-i Hak)*, Tercüme: Engin Öpengin, Avesta, İstanbul 2009
- M. Şerif Fırat, *Doğu İlleri ve Varto Tarihi*, MEB, İkinci baskı, Ankara 1961
- Malmîsanij, "Derheqê Kirmancanê Modanî (Motkanî) de", *Vate: Kovara Kulturî*, Numre 32, Zimistan 2009
- Malmîsanij, *Kird, Kırmanc, Dimlî veya Zaza Kürtleri*, Deng Yayınları, İstanbul 1996
- Mecdeddîn Yakûb Fîrûzabadî, *El-Qamusu'l-Mûhît*, C. 3, Misir 1979
- Mehdî Özsoy, "Şêx û Mela", *Çira, kovara kulturî*, Hejmar 3, İlon 1995, Stockholm
- Mehmed S. Kaya, *The Zaza Kurds of Turkey: A Middle Eastern Minority in a Globalised Society*, Tauris, London 2011
- Mehrdad R. Izady, *Kürtler Bir El Kitabı*, Doz Yayınları, İstanbul 2004
- Muhammed Alî es-Siwêrekî el-Kurdî, *Ürdün Kürtleri*, Tercüme: Qedrî Yıldırım, Avesta, İstanbul, 2006
- Munzur Çem, *Dersim Merkezli Kürt Aleviliği*, Vate Yayınları, İstanbul 2009

- Munzur Çem, *Hawara Dêrsimî*, Weşanên Deng, İstanbul 2003
- Murat Alanoğlu-Muhammet Yücel, "Dimli-Zaza Adı ve Tarihsel Gelişimi", *1.Uluslararası Zaza Dili Sempozyumu (13-14 Mayıs 2011)*, Bingöl Üniversitesi Yayınları, Bingöl 2011
- Musa Anter, *Ferhenga Khurdî-Tirkî*, Yeni Matbaa, İstanbul 1967
- Mustafa Kemal, *Nutuk*, Cilt: I (1919-1920), Devlet Matbaası, İstanbul, 1934
- Old Testament (Tanakh), Chronicles-I, 2:33
- Osman Sebrî, "Êzdî û Ola Wan-3", *Ronahî (Supplemen illustré de la revue Hawar)*, Hejmar 21, Şam, Aralık 1943
- Peter J. A. Lerch, *Forschungen über die Kurden und die Iranischen Nordchaldaer - Band I*, St. Petersburg 1857
- Peter J. A. Lerch, *Forschungen über die Kurden und die Iranischen Nordchaldaer - Band II*, St. Petersburg 1858
- Pîr Riza Yagmurî de îtiqad ser o (Qisimo 1.), <http://dersiminfo.com/pir-riza-yagmuri-de-itiqad-ser-o-qisimo-1/>
- Pîr Riza Yagmurî de îtiqad ser o (Qisimo 3.), <http://dersiminfo.com/roportaj-pir-riza-yagmuri-de-itiqad-ser-o-qisimo-3/>
- Q. Kurdo, *Ferhenga Kurdî-Rusî*, Neşirxana Dewletê ya Ferhengêd Zimanê Mile-têd Dereve û yê Sovêtîstanê, Moskowa 1960
- Radyo Kurdane, <http://kurdane.com/>
- Roşan Lezgîn, "Dimîli/Zazaki ve Zazalar Üzerine", <http://www.zazaki.net/haber/dimilizazaki-ve-zazalar-uzerine-979.htm>
- Roşan Lezgîn, "Khormek Sözcüğünün Kökeni Hakkında", <http://www.zazaki.net/haber/khormek-sozcugunun-kokeni-hakkinda-440.htm>
- Roşan Lezgîn, "Mewlidê Kirdî", <http://www.zazaki.net/haber/mewlid-kird-57.htm>
- Roşan Lezgîn, "Nameyê Dew û Mezrayanê Licê", <http://www.zazaki.net/haber/namey-dew-mezrayan-lic-80.htm>
- Sait Kılıç, "Şarik Şiwon", *Ez Mireno*, 2007 (CD-Album)
- Sanskrit Dictionary, <http://spokensanskrit.de/>
- Serdar Yıldırım, "The Use of the Name 'Zaza' and the Understanding of 'Kurdishness' among Zaza Villages of Lice and Hani", *International Conference The Zaza People: History, Language, Culture, Identity*, Yerevan, Armenia, 28 October 2011
- Strabo, *The Geography of Strabo V*, terc. Horace Leonard Jones, William Heinenmann 1961
- Seyîdxan Kurij, "Zazalar ve Zazaca Yazını", http://www.zazaki.net/file/zazalar_v...pdf
- Strabo, *The Geography of Strabo VII*, terc. Horace Leonard Jones, William Heinenmann 1930
- Şeref Xan, *Şerefname*, Tercüme: M. Emin Bozarslan, Hasat Yayınları, İstanbul 1990
- Tahsîn Yazıcı, "Deylem", *Türkiye Diyanet Vakfı İslam Ansiklopedisi*, C. 9, TDV, İ-

tanbûl 1994

Tapu Kadastro Erzurum 8.Bölge Müdürlüğü, <http://www.e-tkbn.gov.tr/publisher/tkdurumilce.asp?ilceid=856>

Temple of Ninni-zaza, http://www.homsonline.com/EN/Citeis/slides/Mari_WorshipperStatuette.htm

Th. Bois, D. N. Mac Kenzie, V. Minorsky, *Kürtler ve Kürdistan*, Doz Yayınları, İstanbul 2004

The Behistun inscription, Column 1, lines 91-96, <http://www.livius.org/be-bm/behistun/behistun-t11.html>

V. Bardizaksi, B. Natanyan, K. Srvantsyants, *Dersim Gizemi, Palu-Harput 1878*, 2.Cilt, Derlem Yay., İstanbul 2010

V. Minorsky, "Kurds, Kurdistan", *The Encyclopedia of Islam - V*, Brill, Netherlands 1986

Wikipedia, "Mitanni", <http://en.wikipedia.org/wiki/Mitanni> (resayış: 03.04.2012)

Wisif Zozanî, "Asmênê Kirdan ra Estareyêko Nimite: Mehemed Elî Ewnî", *Nûbihar*, Hûmare 118, İstanbul 2012

Wisif Zozanî, "Dünbülîler, Zazalar yahud Kirdler" (meqaleya nêweşanîyaye)

Wisif Zozanî, *Derheqê Tarîx û Zûnî Kirdûn di Panel*, Çewlîg, 02.04.2011 (vîdeo)

Yakut El-Hamawî, *Mucemu'l-Buldan*, C. 3, Daru's-Sadr, Beyrut 1977

Yusuf Ziyaeddin Paşa, *El-Hediyye El-Hamidiyye fi'l-Lûgat El-Kurdiyye*, Tercüme: M. E. Bozarlan, Çıra, Stenbol, 1978

Zana Farqînî, *Ferhenga Kurdî-Tirkî*, Ensîtuya Kurdî ya Stenbolê, Çapa dîyine, Zend Yayınları, İstanbul 2005

Zazai.de, "Zazî", <http://www.zazai.de/zazien.html>

Zazaki.org, "Munzur Çem ile Röportaj",

<http://www.zazaki.org/modules.php?name=News&file=article&sid=17>

Zazalarkoyu.com, "Tarihçemiz", <http://www.zazalarkoyu.com/tr/tarihcemiz>

Zeki Alimoğlu, "Zazaca Kürtçenin Bir Lehçesidir", <http://www.zazaki.net/haber/zazaca-kurtcenin-bir-lehcesidir-721.htm>

Zılfi, "Ferhengok: Dımilki-Kurmanci-Tırki", *Hêvî: kovara çandîya giştî*, Hejmar 1, Parîs, Îlon 1983

Zılfi, "Folklorê Kurdi ebe Zarava Dımilki-II", *Hêvî: kovara çandîya giştî*, Hejmar 2, Parîs, Gulan 1984

Ziya Gökalp, *Kürt Aşiretleri Üzerine Sosyolojik Tetkikler*, Sosyal Yayınlar, İstanbul, 1992